

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

87
2023

bîrnebûn





Tidskriften utkommer 3 nummer per år.
Çar mehan carekê derdikeve.
Utges av Apec Förlag AB
hejmar 87/ 2023
Ansvarig utgivare: Alî Çiftçi
Editor: Alî Çiftçi, Heciyê Gulê, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê:
Alî Çiftçi, Seyfî Dogan, Mem Xelikan
Dr. Bangin Fayo, Muzaffer Özgür, Hecî Delalî
Prof. Dr. Hacı Akman, Ecevit Yıldırım,
Mehtab İdelfî, Xizan Şilan, Bilal Celepli
Halil Mirzan Küçükildiz, Hızır Akbina

Belavkirin / Distribution:
Ewropa: Muzaffer Özgür
Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Numra kontoya li Swêdê:
(Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224
Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê
APEC, "Bîrnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden
BIC/SWIFT: DABASESX
IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874
Çap / Baski: Apec-Tryck AB

Biha/Pris:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 30 TL
Abone ji bo du salan
Swêd: 400 SEK -Almanya 50 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Medya Kitapevî
Bekar Sokak No: 7, Giriş kat.
Beyoğlu / İstanbul / Türkiye

Adress
Navnîşana li Swêdê
Apec

Mjölmarstigen 1
SE 163 41 Spånga/Sverige
E-post: info@apectryck.se
Internet: www.birnebun.eu

Her nivîskar bersive nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tî, sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegeandî. Ji ber stîl û devokên taybet em dest nadin hinek nivîsên nivîskarên xwe.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela Ziman li Almanayê piştgirîrên kovarê ne.

Wêneyê berga pêşîn: Fata Elê Simo ji Xelikê Jor

bîrnebûn

87

2023

ISSN 1402-7488

bîrnebûn 87/2023

Naverok

Ji bîrnebûnê	4	Alî Çiftçi
Sûperstarê Danîmarkê, Tobias Rahim Seçilmiş	6	Alî Çiftçi
Li Încovê bûyereka bi nîrx	10	Hecî Delalî
Kilamên me, Elî Axa	12	Mem Xelîkan
Yek ji navdarên bajarê Borlângêyê, Azad Yosef Erdem	14	Alî Çiftçi
Gera Yalê	19	Ecevit Yıldırım
Kravatê sor	25	Halil Mirzan Küçük yıldız
Lêlê	29	Dr. Bangîn Fayo
Şîret	31	Seyfî Doğan
Lolo	32	Bilal Celebli
Mast	35	Mehtab Îdelî
Quto	44	Seyfî Doğan
Qerfo	45	Seyfî Doğan
99 gotinên Albert Einstein	46	Nuh Ateş
Tûrikê xeman	48	Xîzan Şîlan
Îdeolojiya namûsê	50	Prof. Haci Akman
Pîşt û gûstîlk	70	Seyfî Doğan
Xumîna hestan	72	Xîzan Şîlan
Henek	74	Seyfî Doğan
Almanvanê me Kudî	75	Hızır Akbina

Ji Bîrnebûnê

Li welêt îsal piranîya cotkaran nika-ribûn berhemên xwe bifroşin. Genim û ceyên xwe anîn, wek demên berê li ber malên xwe lod kirin. Rewş li gor ku tê xuyakirin ji alîyê siyasî, aborî û çandî ve rind xuya nake!

Helbet, ev şerê Rusya û Ukranyayê jî bandoreka mezin li seranserê welatên Ewropayê û her wiha li welatê me jî dike.

Konjuktura dinyayê ber bi guhartinên mezin ve tere. Di van guharînên nû de rewşa kurdan çî ye, dê çî bibe, ne zelal e. Li Bakûrê welêt û di nav kurdên me yên Anatolîya Navîn de guhartinên mezin ku li ber çavan dikevin, ji derveyî rewşa aborî rewşa ziman û nasnameyê ye. Asîmîlasyoneka pir bi şidet hem li zimên û hem jî li mêjî kirîye.

Herçiqas hişyarbûn û xwenaskirinek hebe jî, bi taybetî li welêt ji ber rewşa siyasî insanên me nawêrin tu tiştekî bikin, heta ew tîrsa li ser insanên me yên ku li welatên Ewropayê koçber in jî bandoreka xwe ya pir neyênî dike.

Li beravajî rewşa ku niha li welêt heye, di nav neslê nû de jî pêşketinên mezin hene, bi taybetê di nav kurdên me yên li derveyî welêt dimînin.

Superstarê Danîmarkê, Tobias Rahim Seçilmiş yek ji wan e. Tobias,

bi strana xwe ya bi navê ”*Kurdên li Kopenhage*” îsal di destpêka havînê de li festîvalên mezin yên wek Roskilde ku yek ji wan festîvalên mezin ên Danîmarkayê ye, muzîk û govenda kurdan bi sed hezaran da nasîn. Di vê hejmarê de me bi kurtî Tobias daye naskirin û strana wî ji zimanê danîmarkî wergerandîye kurmancî.

Mustafa Kızılkaya yek ji wan koçberên ku piştî cunta eskerî ya 12ê îlona 1980î li Turkîyê bi darê zorê hatibû ser hukum, mecbur mabû derkeve derveyî welêt, îsal li gundê xwe, li Încovê, du kitêbên xwe li hewşa mala xwe bi kurdî dabûn nasandin. Hecî Delalî xebera vê bi sernivêsa *Li Încovê bûyereka bi nîrx* nivîsiye.

Birêz Mem Xelîkan di rêzenivîsa xwe *Kilamên me* de îcar kilama bi navê *Elî Axa* û serborîya kilamê bi med dide nasîn.

Azad Yosef Erdem, ji Mêrdînê ye. Ew jî mexdûrê cuntaya 12ê îlona 1980î bû, piştî cuntayê 1981an de derbasî bin xetê, Surîyê dibe û ji wir jî tê li Swêdê, li bajarê Borlängeyê bi cîh dibe. Azad xwedîyê însiyatîfa yekemgoristana bealî li dunê ye. Bi sernivîsa *Yek ji navdarên bajarê Borlängeyê*, Azad Yosef Erdem em xebatên wî yên komelayetî û çandî didin nasîn.

Ecevit Yıldırım gernameyeka xwe bi navê *Gera Yalê* nivîsiye. Di vê gernameyê de ew cîh û warên ku mezînen malbata wan jê hatine, bi çend wêneyan ve bi me dide nasîn.

Halil Mîrzan Küçük yıldız serpêhatîya malbateka ji Anatoliyê wek kurteçîrokekê bi navê *Kravatê sor* nivîsiye.

Dr. Bangîn Fayo di folklorê kurdan de li ser gotina *Lêlê* sekiniye û di nav zargotin û stranên kurdî de çîng hatîye bikaranîn bi çend nimûneyan li gor xwe şîrove kirîye.

Seyfî Doğan di helbesta *Şîret* de ji bo parastina kesayetiye û zimanê kurdî şîret nivîsiye.

Bilal Celebli gotina *Lolo*, ji lorîyên dergûşan ji çend gundan mînak berhev kirîye û herwiha li ser girîngîya strandina “lorîyan” nivîsiye ku di pêşketina kesayeti û ziman de ji bo zarokan çiqas giring e.

Birêza Mehtab Îdelî vê carê li ser mast lêkolênka dîrokî kirîye. Bi sernivîsa Mast hem ji dîrokê û hem ji cureyên çekirina mast bi wêneyan bi me dide nasîn.

Birêz Seyfî Doğan bi kurtehelbestên xwe *Quto* û *Qerfê*, Nuh Ateş bi wergerandina 25 gotinên ji 99 gotinên *Albert Einstein*, Xîzan Şîlan bi du helbestên xwe, Tûrikê xeman û *Xumîna hestan* ev hejmara me dewlemendtir kirine.

Prof. Hacı Akman bi lêkolîna *Îdeolojiya namûsê, windakirina namûsê û xwîna di navbera du eşîrên kurdan de* di perspektîveka dîroka eşîrtîyê û girîngîya parastina eşîrtîyê de lêkolaye. Di vê lêkolîna birêz Akman de, em girîngîya malbat, namûs û erk, di çîrokên kurdî de, di çîrokbêjîya devkî de bûyerên ku li ser namûsê bûne û herwiha şerên navbera eşîran de çîng û bi çî awayî dest pê kirine bi berfirehî dibînin.

Mîrasên çandî diyardeyên adetên maddî û manevî ne ku ji dîrokê de mane. Nîrx, bawerî, zanîn û kevneşopîyên mirovan nîşan didin. Di çanda me de **pişt** û **gûstîlk** nîşanên pir bi nîrx in.

Birêz Seyfî Doğan bi sernivîsa *Pişt û gûstîlk* kurtenivîseka balkêş di vî warî de nivîsiye.

Hızır Akbîna hekata Hacı Osman, kurdekî ji Anatoliyê bi navê *Almanvanê me Kudî* nivîsiye. Di dema salên 1970î de piraniya kurdên ku ji Anatoliyê diçûn welatên Ewropeyê ji ber bêkarî û xizanîyê diçûn. Çîroka Kudî jî ji wê dest pê dike ku piraniya “almancî” yên wê demê dikarin di hinek waran de xwe di serpêhatîya Kudî de bibînin.

Bi hêvîya ku ev hejmar jî li gor dilê we be, bimînin di xêr û xwaşîyê de heta hejmara bê!

Alî Çiftçi



Li Danîmarkê stranbêjê bi nav û deng,
sûperstarê Danîmarkê,
Tobias Rahim Seçilmiş Hasling
bi hezaran hezkirîyên xwe ve hem govenda kurdi
lîst û hem jî kilama *Kurdên li Kopenhagê* stra

Alî Çiftçî

Tobias Rahim Seçilmiş Hasling di 1989an de hatiyê dunê, bavê Tobîas ji gundê Kelhesen Tahîr Secilmîş e û diya wî danîmarkî ye. Tobias Rahim, bi navên Toby Tabu û Grande jî tê nasîn, stranbêj û helbestvanekî danîmarkî-kurd e.

Kurdên li Danîmarkayê piranî koçber an jî ji zaroyên koçberên Danîmarkayê ne. Hejmara wan tam

nayê zanîn, ji ber ku welatê ku jê wek koçber hatine; Tîrkiye, Iraq, Îran, Sûriye û hwd bi diyarkirina neteweya wan welatan ve hatine tomarkirin, lê tê texmînkirin ku li Danîmarkayê di navbera 90.000 û 100.000 kurd hene. Piraniya kurdan ji Anatoliya Navîn hatine Danîmarkayê. Tê texmîn kirin ku ji sedî 60ê hemû kurdên danîmarkî ji Tîrkiyê ne

û piraniya wan ne ji Kurdistanê Tirkîyê ne, lê ji devera Konya ya Tirkîyê ne. Kurdên Anatoliya Navîn ji dawîya salên 1960î û destpêka 1970î de wek karkerên mêvan hatin Danîmarkayê. Kalê Tobias, Remezan Seçilmiş (Remoyê Alo Çavîşî Xatikê) jî di destpêka 1970î wek piraniya ev kurdên Anatoliyê ku ji bo dewara malbatên xwe bikin, derketibûn derveyê welêt, bi hêviya ku ev dê li Danîmarkê çend salan kar bike û pişt re vegere nav malbatê xwe, her tiştên xwe yên ku jê hez dikir û pê dizanîn li paş xwe hiştibû hatibû Danîmarkê. Lê hêviya ku dê rojekê paşde vegere, wek bi hezaran kurdên din ji bo wî jî ev hêviya bi çîh nehatibû. Kurê wî Tahîr Seçilmiş jî piştî cunta 1980î ji ber sebebên siyasî hatibû girtin û piştî ji girtîgehê derket ev jî mecbûr dibûne berî xwe dide welatê xerîb û tê li ba bavê xwe li Danîmarkayê bi cîh dibe.

Ev demên salên 1970î û 1980î li welatên Ewropa karkirin û ji xwe re cîh û war peyda kirin ne hêsan bû!

Îro, zarok û neviyên wan, ji neslên nû li piraniya welatên Ewropa di nav pêşketiyên van welatan de hinek ji wan şûna xwe girtine. Tobias Rahîm Seçilmiş jî yek ji wan e ku îro hem xelkê danîmarkî û hem jî kurd li seranserê dunyayê bi wî serbilind in.

Her ciqas niha li seranserê welatên Ewropayê nijadperestî pêşbikeve jî li

hember wê rawestineka xort jî heye. Pêşketina zaroyên koçberan şahîdiyê ji vê yekê re dike.

Niha serokwezîrê Bîrîtanyayê Rishi Sunak bi eslê xwe hindî ye. Tobias Rahimê neviyê Remezan Seçilmiş ê kurd û danîmarkî ji 78.000 kesan re li Kopenhagê got: "Bi tiliyên xwe yê biçûk bi hev bigrên û dans bikin" û govenda kurdî bi muzika kurdî ya folklorîk govendeka girseyî da girtin. Tobias Rehîm ê 33 salî ku bavê wî kurdê ji Konyayê ye ji Kelhesen e û dayika wî danîmarkî ye dewlemendîyeka nû li muzîka Danîmarkayê kir.

Di nav danîmarkiyên navdar ên pêşketî de kurdên danîmarkî, stranbêj Node, Rajîn Nabaz, Tobias Rahîm, Burhan Genç nivîskar Sara Omar û siyasetmedar Yildiz Akdogan, Lars Aslan Rasmussen û Özlem Çekiç hene. Û bi sedan ji neslê nû yê ji kurdên Anatoliya Navîn ku xwandina bilind kirine, di îdareya dewletê û şîrketên mezin yê navnetewî ku tîn naskirin de xwadî karên pir bi nîrx in.

Tobias bi strana xwe ya "*Kurdên li Kopenhagê*" ev rastîya bi hunereka serkeftî pir rind anîyê ziman. Bi hewkariya ZK & Luna Erşahin, Alper Şahîn Tobias Rahim li Royal Arena û li festîvala Roskilde da strana *Kurder i København* li gel govanda kurdî nav da!

Tobias li ser rûpela xwe ya Instagramê ev strana xwe veng nivîsiye:

"Bi taybetî stranek heye ku ji bo min pir bi wate bû ku ez li Royal Arenayê bistirê. Kurdên li Kopenhagê... strandina vê stranê li ser sehneyeka veng mezîn bi serê xwe bo min gotinek bû. Ji min re gotinek kesayetîyeka mezîn. Dema ku kalê min dev ji gundê Tirkîyê berda, malbata xwe û her tiştê ku pê dizanibû, li dû xwe hişt, ne ji bo kêfê kir, ji ber ku armanceka wî hebû ku dê malbata me li cîyekî din bawtir bibe. Wî ev yeka kir. Ji bo ku nîşên

nû ji belengazîyê biparêze çi ji destê wî hat kir. Û gava, piştî çend salan bi rêwîtiyeka diwar ji Balkan û li deverên din re derbas dibe bi şûnda ew tê li Danîmarkayê bi cîh dibe. Zahmetîyên wî, hîn nû dest pê dikin. Wî wekî firaxşo dest bi kar kir. Wî ji kesên ku ji wî re digotin, serreş re firax dişust! Ew pir xebitî û paşeroja malbata me guherand. Maşellah Ramazan Seçilmiş!.. Tu mirovekî pir delal î. Ez li vir, li ser sehnê sekinîme, ji bo rûmeta te û tevahiya malbata te. Ez serbilind im ku ez nevîyê te me!..."

Kurdên li Kopenhagê¹

Kurdên li Kopenhagê

Karkerê biyanî di karê xwe de bi pêş ket

Em êdî wekî berê ne biyanî ne

Bira hedefa me çiyayê herî bilind be

Û piştî em ê hefizyekî ava bikin li Kelhasanê

Hefizyek li Kelhasanê

Malbatê berfireh bikin

Were pismam, were dotmam

Kurdên li Kopenhagê

Karkerê biyanî di karê xwe de bi pêş ket

Em êdî wekî berê ne biyanî ne

Bira hedefa me çiyayê herî bilind be

Û piştî em ê hefizyekî ava bikin li Kelhasanê

Hefizyek li Kelhasanê

Malbatê berfireh bikin

Were pismam, were dotmam

¹Me strana Tobias ji zimanê danîmarkî wergerand kurmançî ji bo xwendevanên Bîrnebûnê.

Kurdên li Kopenhagê
Kurdên Kopenhagê
Em li vir in ji bo ku bi hev re deng derxin
Ji ber ku pir tişt hatiye serê me
Werin, em bi hev re rûnin
Ji roja ku em hatine, heta îro em her bi hev re dijîn.
Çi dibe pismam

Kalê min firax dişuşt
Ji bo kesên ku ji wî re digotin serreş
Spas Xwedayê min ku em li vir in
Û ji belengazîya salên heftêyî xelas bûn
Em êdî ne karkerên mêvan in
Niha em tûristên Alanyayê ne
Tîma Kelhasan li vir e
Dîlana xwe bi govendê geş bikin.

Pismam, tu pismamê min î
Li wê derê gur diherikin li deştê
Û ala berz a tav tê de
Dibêje dê rojên pêş xweştir bibin
Pismamên min, dotmamên min
Li çiyayan ez li kêleka we me
Pismam û dotmamên min
Li çiyayan ez li kêleka we me

Kurdên li Kopenhagê
Karkerê biyanî di karê xwe de bi pêş ket
Em êdî wekî berê ne biyanî ne
Bira hedefa me çiyayê herî bilind be
Û piştî em ê hefizyekî ava bikin li Kelhasanê
Hefizyek li Kelhasanê
Malbatê berfireh bikin
Were pismam, were dotmam



Li Încovê bûyereka bi nîrx!

Hecî Delalî

Nivîskarek li gundê xwe
cara yekem e kitêbên xwe
bi kurdî dide nasandin.



Wek tê zanîn **Mest -Mustafa Kızılkaya**-nivîskar û helbestvanekî ji kurdên Anatolîya Navîn li beldeya Încovê ye û li Swêdê dijî. Mestê di 22ê tirmehê de, li Încovê resepsiyonek ji bo nasandina du pîrtûkên xwe “*Ga Westîyan*” û pîrtûka bi zimanê tirkî “*Sınır Boylarında*” pêk anî. Gelek heval, hogir û gundîyên wî kom bûn, bi hev re li piştgirîya wî sekinîn. 120 kesî zêdetir însanên me, jin û mêr beşdar bûn. Ji ewana yek jî ez bûm. Mestê di baxçê xwe yî delal da, li bin sîya daran û cîyekî serîn da civîn amede kiribû. Mîvanên ku hatibûn pir kêfxweş bûn. Bi dawxaza Mestê ez jî kêleka wî rûnîştim û me dest pê kir.

Me mêvanên xwe xêrhatin kirin û piştra min bi zimanê tirkî çima kitêba “*Sınır boylarında?*” hate nivîsandin, pêşkeş kir. Gava dor hat kitêba helbestan, Mestê helbesta bi navê *Ga westîyan* bi awazakî xemgîn xwend û hestên me derketin ser zîrvê. Bi rastî cara yekemîn bû ku nivîskarekî li gundê Încovê bi zimanê kurdî kitêbên xwe dida naskirin û bi zimanê xwe helbestên xwe dixwand. Ji mîvanan çend kes mîkrofon girtin û li ser bûyer û kitêbên Mestê dîtî û ramanên

xwe gotin. Piştra Mestê pîrtûkên xwe îmza kirin û li beşdaran belav kir. Di wê navberê de xwarin û vewxarin jî hat û li mîvanan nan xwarin û belav bûn.

Bi bîr û bawerîya min civîn pir balkeş derbas bû. Nivîskarên me yên Anatolîya Navîn gelek bi qedîr û qîmet in. Ewana dest pê kirin û ji hunermendên me yên pêşerojê ra dibin rêber. Ji Mesto ra serkeftinê dixwazim.

Bawer im em ê hîn pir carên dîn hevdu bibin.

Dilê te sax bibe, Mesto...





KILAMÊN ME (XI)

Mem Xelîkan

Elî Axa

Gundê Rûta (Yeni Mehmetli) gundekî kurda yî girêdayîyê Polatli ya Ankarayê ye. Kurdên canbeg lê bi cih û war in. Elî Axa (Tiryakî), xortekî Mala Xelê ye. Xortekî bejnzirav, çeleng, cêmer (wêrek) û sergovend e. Sergovendekî wîkasi baş bûye ku li dawetekê nehate diyinê ew daweta bi kêmayî dihate diyinê. Hezîrîyê gundî û hevala ye. Ji bo wê heval û gundîyan navê wî Elî Axa lêkirine.

Malbata Malê Xelê jî, wek gundîyên din debara xwe bi cotkarîyê dike. Elî Axa, bi çûkê sê bra ye. Bavê sê zaroka ye. Du keç û lawek. Di berî mirinê xani-

ma wî bi ducana ye. Ew hezîrîyê dost û hevalan xortê çeleng û berdilkê malbatê, bi qezayekê neçê û giran jîyana xwe ji dest dide.

Elî Axa, rojeka 1955an ji bo ku here Polatliyê bi motorê xwe bi rê dikeve. Xortekî 29 salî ye. Li ser rê, li Bordeliyê (herêmeke gund e) newaleke mezin heye. Li wir motorê xwe werdigere û Eli Axa bin motirde dimê. Giran brîndar dibe û jîyana xwe ji dest dide.

Ew xebera rêş û giran tê gund, xaltîya wî Eş li şîna Elî Axa kilama li jêr gotîye. Ew kilama ji alîê Kurd Remzî yê rehmetî ve di qasetê de hatiye xwandin.



ELÎ AXA

Terleya brayê min li Axerê
Şiv kiri ye şevtîya naxirê
Xeberek hatiye dora gund e
Elî ketiye bin motirê

Bi qurban bim tu Elî ye
Keko giran dakeve pêşî gelî ye
Ew qedera malê Xelî ye
Mîrî felekê xwe dayê pêşîyê

Li ser bendê li ser bendê
Pişkoj vênakeve serî zendê
Dawetekê li gundê me lêdikevê
Elî tine li serî govendê

Elî Axa ye Elî Axa ye
Li Bordelîyê bi tenê maye
Pîyê rastê binda maye
Bi pîyê çepê li ber xwe daye

Motirê Elî min Fort e motirê Elî Fort e
Elî, kal û pîrê gundî me xwe dane dor te
Qe tu gedekî çarsalî nebû
Xwe bavê erdê tu yî xort e

Çavkanî: Serketî Pola (Brazîyê Elî Axa)

Yek ji navdarên bajarê Borlängeyê, Azad Yosef Erdem

Xwadiyê însiyatîfa yekem goristana bealî li dunê

Alî Çiftçi



Azad li Goristana Êzîdiya
Navê goristanê bi kurdî û swêdî veng lê hatiye
nivîsîn:

ZAHMANÊ ÊZÎDÎA LI DALARNA
Ezidiska begravningsplatsen i Dalarna
Anlagd 2010



– Ez 1989an de bi rêya kar hatim Dalarnayê, li Daîreya Koçberan ya Swêdê min kar dikir. Piştî demekê min biryara xwe da û hatim li Borlängeyê bi cîh bûm.

Min ji karê kulturî hez dikir. Cara ewil min li Borlängeyê pêşengeha wêneyên Georg Kristiansen, Ann Eriksson û yên min bi xwe ku li Kurdistanê hatibûn wergirtin, di pêşengehê da nîşan da.

Di 1989an de komeleyek bi navê *Žiriyab* û 1990an de jî komela *Kulturî Kurd li Borlängê* me ava kir.

Hevalên min li vir, bi piranî swêdî bûn, têkilîyeka min a baş bi şaredariya vir re hebû. Hevalên min ji Kanada, ji Avustralya, ji welatên din û yên swêdî hebûn. Gîştika alîkariya min dikirin. Me bi hev re di 1994an de li vir komeleya bi navê *International Dialogenê* ava kir.

Piranîya komeleyên xerîban û yên swêdî, çi siyasî û çi jî yên civakî bin endamên wê komelê

ne. Ev komele hîn ji berdewam e. Bi sala ne ku ez serokatîya vê komeleyê dikim.

Piştî ku min li vir, li Daîreya Pêneberan kar kir, min Suzan nas kir, di 1991an de. Em zewicîne û sê zarokên me hene. Berî salên 1990î dema min li Borlängeyê kar dikir, kurd li Borlängeyê tunebûn. Min du malbatên kurd anîn vir. Wê demê tercumanên kurd jî li Borlängeyê tunebûn. Min got ez hal dikim. Min pirê cara ji wan re bê pere tercumanî dikir, alîkarîya wan dikir.

Têkilîya min bi şaredarîyê re rind bû. Peyderpey pênaberên kurd li Borlängeyê zêde bûn. Ji du mala niha bawer im li Borlängeyê di navbera 2500, 3000î de kurd hene. Piranîya kurdên li vir ji Bakur, ji Başûr û Rojava ne. Ji Rojhilat hene, bes kêm in, 10 -15 mal hene.

1992an de min ji xwe re bi navê *Sibylla* restorancekek vekir, çend salan min ev kara jî kir.

Dema kurd li Borlängeyê henkî zêde bûn me bi wan re civinek çêkir û *Komeleya Kurd* jî hat avakirin. Êdî beledîya Borlängeyê her sal kurd wergirtin.

Li ser pirsê ku hevqes kurd niha li Borlängeyê dijîn gelo ev

debara xwe çing dikin. Josef Erdem wiha bersiv da:

– Piranîya kurdên ku hatin vira nexwanda bûn, piştî demekê ji xwe ra restorant û pizzerîya vekirin. Niha li vê herêma Dalarnayê, ji Borlängeyê heta Avesta û derûdora wê jî zêdeyî 140 restorant û pizzerîya ji aliyê kurdên vira ve hatine vekirin.

Azad Josef Erdem li Borlängeyê yek ji wan profilên Borlängeyê hatiye dîtin.

Di kitêba bi navê *"Profiler och personligheter i Borlänge 2* yan de, nivîskar Jan Delbom Azad wiha dide naskirin:

Ew silavê li herkesê dike û di hemû jiyana xwe de piştgirî û alîkarîya mirovan kiriye bêtir ku li paşerojê û bawerîyê wan binêre. "Em tev ji Keştîya Nûh in!"

Josef Erdem piranîya jiyana xwe ji bo mafên hindikayîyên etnîkî û olî têkoşîn kiriye.

Wî însiyatîfa yekemgoristana bêalî ya cîhanê li dêra Stora Tuna girt.

Li ser vê pirsê me Azad wiha dibêje:

– Ez li wir di karê kulturî û civakî de di nav komeleyan de aktîf bûm. Bi taybetî di komela

DIALOGê û Komela Kurd de. Me di 2004an de kluba Dalkurd FF li Borlängeyê ava kir. Min di yekem lijneya demkî (Komîta Karger a demkî) de cih girt.

– Ji ber ku min li Dalarnayê ji 30 salî zêdetir kar kir, berî bi du salan şaredariya Borlängeyê bi sateka zêrînî ez xalat kirim. Şaredar di gotara merasîma vê xelatê de got: ”*We li Dalarnayê sê tiştên nû li kultura me zêde kirin;*

1 Muzika kurdî

2 Çanda kurdî

3 Newroza kurdî.”

Di nav van çalakîyên komeleyatîyê de du xebatên din ên pîroz li Borlängeyê em dibînin. Yek ev goristana neutral (bêalî) yan din jî goristana ezîdîyan. Tu dikarî hinekî bo me qal bikî ev herdu karên pîroz we çing dest pê kir?

– Dema kurdên me yên êzîdî li vir zêde bûn, pêwist bû em wek kurd, wek însan bi navê Komela Kurd li wan xwedî derkevin.

Pêwîstîyek bi goristaneka taybet bo êzîdîyan hebû, ji ber ku goristana misilmanan hebû. Min berê wek berpîrsê Komela Kurd ji bo goristana misilmanan jî bi meclîsa dêrê re civîn çekiribû. Ez, hem wek berpîrsê Komela

Kurd û hem jî wek serokê komela DÎYALOGê bi meclîsa dêrê re dîsa ketim têkilîyê û me daxwaza goristaneka taybet bo kurdên me yên êzîdî kir. Di Meclîsa Dêrê (Svenska Kyrkan) de hemû berpîrsên partîyên siyasî cih digrên, ji wan tu kes li dijî vê dawxazîyê derneket, giştikan piştgirî dan. Ev bû yekem goristana ezîdîyan li Dalarnayê. Niha yek jî li Skåneyê jî heye. Kurdên me yên êzîdî bi vê yekê pir dîlşa bûn.

– Goristana bêalî (neutral) ji bo ev kesên ku naxwazin sembolên dinî li goristana wan hebin. Yanê bawerîya te ya dînî çî dibe bila bibê, herkes dikare di vê goristanê de bê weşartin, tenê bi şertekê ku tu sembolên olî neyên bikaranîn.

Tu misilman bî, xiristîyan bî, yahûdî bî, ateist bî û naturîst bî çî dibî bibî dikarî di vê goristanê de bêtî veşartin.

Ya din jî hinek însan hene ku bi hev re zewicîne, bo nimûne: yek jê misilman û yek jî xiristîyan be, ku dîne xwe hiştine, divê bikaribin di eynê goristanê de bi rihetî bêtî veşartin. Ê min bi xwe li Kurdistanê hevalên min ên misilman, ên xiristîyan, ên yahûdî û



Goristana bêalî (neutral) li tenîştê dêra Stora Tunayê ya Borlängeyê

yên ateîst hebûn, em gîştik bi hev re rihet dijîyan.

Li vê dunê hemû însan bi hev re dijîn, ji bo çi wexta dimirin di goristanên cuda da bên veşartin!

Ji bervêdema ez bi vê pêşnîyarê çûm Meclîsa Dêrê, wan jî ecibandin gotin fikrekî rind e. Ti kes li dijî vê derneket. Bi însîyatîfa min li dunê yekemgoristana bealî li bajarê Borlängeyê, li Swêdê di 2016an de vebû.

Li vê goristanê heman qaîdeyên ku ji bo goristanên din hene, têne bicîhkirin, lê nabe ku ti sembolên olî di girêdana goran de xuya bibin.

Li ser vê bûyerê berpirsa dêrê Ann-Gerd Jansson wiha gotîye:

– Em di civateka pirçandî de dijîn û wasîfa me ye ku em ji çandên cihê re jî cih amade bikin û fersendê bidin mirovan ku li goristanek bêalî werin veşartin.

Dema ku jê tê pirsîn ku divê merasîmek çawa li cîyek bêsembol pêk were, Ann-Gerd wiha gotîye:

– Heger hûn ji dêrê bin, li dêrê yan jî li goristanê merasima cenaze tê kirin û paşê jî tabûtek an jî urneyek li vir di cih de tê veşartin. Ger cenazeyek sivîl be, defînkirin jî li vir tê kirin.

Ev bûyer li Ewropayê pir balê dikişîne û ji *The Independent* yek ji rojnameyên rojane yên Brîtanyayê ye û televîzyona



hêşînayî û bi darûber e. Li goristanê min dît ku yek gor tenê heye, bala min kişand, çûm ser mezel min dît bi kurdî li ser veng hatîye nivisîn:

Rachid Abdull Majid

1929-2018

Em bi hev ra

Em bi hev ra

Xelaskin welatê Kurdistan

Niha tenê yek kes hatîye definkirin, ew jî xezûrê Josef Erdem e. Dema me pirs kir ka ev çi tesaduf bû ku yekem kesê ku niha li vir hatîye veşartin xezûrê wî ye?

– Ew di sala 2018an de çû ser dîlovanîya xwe, xeberê wî ji vê goristanê hebû, li ser daxwazîya wî me ew li vir defin kir.

Pir kesan eleqe nîşan dane. Yek ji wan mamoste Gunnar Lundgren e. Lundgren dibêje:

– Ez naxwazim li ser gora min kevirek bê dayîn ku divê lênêrîna wî bê kirin û herwiha ji ber ku ez ne bawermend im, cenazeyê dêrê jî naxwazim. Ji ber vê yekê ew ji min pir baş e.

Brîtanyayê ya bi navê CNNê, tên bi Azad Josef Erdem re hevpevinekê dikin û jê pirs dikin ka ew ji ku ye û bo çi însiyatîfeka wiha girtiye.

Josef Erdem dibê: ez kurd im, ji Kurdistanê hatime. Li ba me pir kesên bi bawermendîyên cuda û olê cuda hene. Gî bi hev re dijîn û bo çi nikaribîn di yek goristanekê de bên veşartin!

Cihê definkirinê li teniştê dêra Stora Tunayê ya Borlängeyê ye. Cîyekî berfireh, bi

Gera Yaylê

Ecevit Yildirim

Di demên dawî de ji ber karê zêde ez westiyabûm. Min xwest ji xwe re hefteyekî ber bi cîhekî ku min heta roja îro serdan nekiriye herim. Ji bo ku Îngîlîzîya xwe bi pêş xim, ez li ser Îngîltre yan jî Malta fikirîm. Di dawiyê de dengê ji hundirê min go; “Çi karê te heye li Îngîltre û Malta. Here li gundê ku dema zarokatiya te lê derbas bûyî, li çiya, banî, deşt û newala ji xwe re hewayekî bistîne û vegere.”

Bê ku zêde dirêj nekim, di he-man deqê de min bileta xwe kirî. Dora din ya royê sibehê zû berê xwe da balafirgeha Zurichê. Check-in û pasaport kontrola xwe kir û derbasî salona ku li benda balafirê disekinin bûm.

Di wê navberê de rastî surprîzekê hatim. Ez hezar salî jî bifikiriyama, qet nedihate bîra min ku bi kekê Yusuf Polat re rêwîtiyeke bi balafirê bikim. Wekî ku gotina jiyana, rewşa îhtî-

mala her îhtîmalî di hundirê xwe de dihevine tescîl bike rastî kekê Yusuf hatim. Min destê xwe jê re rakir û silav da kekê Yusuf. Bi dîtina min siftê hinekî şok bû. Paşê kenîya ber bi min ve hat û me li hal û xatirê hev pirsî. Me ji



zû de hevdû nedîtibû. Di balafirê de cihên me yên rûniştinê jî tesadufen li cem hev bûn. Sohbeta me ya ku di salonê de destpêkirî, di hundirê balafirê de jî dewam

kir. Me ji xwe re qala bîrnebûnê, dema berê û tabî hinekî jî qala sîyaseta Kurdan kir. Bi wî şiklî me rêwîtiyek xweş bi hev re derbas kir. Ji bo ku kek Yusuf li balafira Qonyayê sîwar be û ez jî ji bo ku li balafira Ankarayê sîwar bim, me xatir ji hev xwest û em ji hev veqetiyan.

Wê şevê piştî ku ez li Enqerê li mala pismamê bavê xwe bûm mîvan. Sibehê zû jî min berê xwe bi otobusê da Quluyê. Kesî haya xwe ji min nebû ku ez hatime Tirkîyê. Di rê de ji bo ku min ji garaja Quluyê heyne, min apê xwe Bilo agahdar kir.

Dora din ya royê ez derbasî gund bûm. Gundê me ya ku li havînê wek bajarokekî qelebalix dibû, di wê demsalê de wek gundekî hatiye terikandin xuya dikir. Ji bilî çend îstîsnayan hemû derî û pencereyên malan gî hatibûn girtin. Li gora ku dihat qalkirin, li gund 600 xanî hatine çêkirin. Lê hejmara malbatên ku her demsalê li gund dimînin ne zêdeyî 50 malbatan e. Heta êvarê li gund mam bi şûnve vegeyriyam Quluyê.

Êvarê ez fikirîm ku sibehê ku de herim. Ji dema zarokatiya min ver de gundê ku kalê min lê jidayik

bûye tim dibû mijara gotinê. Her çiqas niyeta serdana gund di nav malbatê de dihat îfadekirin jî, heta niha ti car nebû nesîp ku serdana gund bê kirin. Bi hizra ku firsend ev firsend e, min biryar da ku herim gundê kalê xwe yê mezin Hacesan bibînim.

Navê gund Eskibektaşlı bû. Di nav sînorên bajarê Sêvas û navçeya wê Gurunê bû. Ji xwe nîvê gundê me ji wir hatibû. Li gundê me jî wek Yayle dihat binavkirin. Ji ber ku kalê min ji wir hatibû li gund jê re Hamoyî Yaylê dihat gotin.

Dema ez piçûk bûm kalê min pir qala wî gundî û bavê xwe Hacesan dikir. Dema kalê min hîn zarok bûye bavê wî Hacesan ji hêla eskeran ve tê kuştin. Ji ber wê bûyerê kalê min jî bi tevî xang û birayên xwe tîc cem meriyên xwe yên li gund bi cîh dibin.

Gava kalê min qala bavê xwe Hacesan dikir, te digo qey qala Robîn Hood dike. Li gor kalê min bavê wî Hacesan dost û hevalê feqîr û belengaza bûye. Tehmûl li neheqiyê nedikiriye. Loma jî xêr bi axayê gund yê bi navê Mehmed Emîn Axa (Moroxli) nedikiriye. Esas kalê min yê mezin Hacesan û Mehmed Emîn

Axa hevalê hev bûne. Lê ji ber zilmkariya Mehmed Emîn Axa, hevaltiya navbera wan vediguhere dijminatîyê. Di nav dijminatîya wan de şer, hing, kuştin, lêdan, entrîqa hema bêje her tişt heye. Kalê min wek qehremanekî qala bavê xwe dîkir. Digo; Mehmed Emîn Axa ji ber tîrsa Hacesan gund terikandiye û çûye xwe li gundekî din veşartîye. Ji bo ku bikaribe were gund Mehmed Emîn Axa kincên jinan li xwe kirîye û bi dizîkî hatiye gund.

Li gor agahiyên kalê min dane min, ez tînim der ku çîroka kalê min yê mezin Hacesan, hinekî dişibe çîroka Hecî Buxurcîyê Omeran jî. Lê ji ber ku agahiyên kalê min dane min agahiyên subjektîf in, min xwest çîroka Hacesan carekê jî ji kesên li Yaylê mane û bêalî ne bibêzîm. Gelo rastiya çîroka Hacesan çî bû?

Sibehê ji zû de ez ji xew rabûm û bi apê xwe re go: – Apo, canê min siqilmîş bû yaw.

– Xêr e, çîr bû?

– Dilê min gerekê dixwaze.

Anaxtarê erebê avête ser min û go:

– Aha ji te re erebe. Dilê te ku derê dixwaze here wê derê.

– Em herin gundê kalê te Hacesan.

– Tu diherî here. Lê ez naxwazim.

Min erebeya apê xwe girt û siftê çûm nava çarşîya Quluyê. Çend kar û barên min yên piçûk li Quluyê hebûn. Min ew hal kirin bi şûn de, erebeya xwe kontrol kir û berê xwe da Sêvaz Uzunyayla, gundê Eskîbektaşliyê.

Di kêleka gola xwê re derbasî Qoçhesarê bûm. Li wir hinekî vexwarin, çerez û merez jî ji bo rê ji xwe re kirî û di ser Benda-va Hîrfanliyê û Qeyseriyê re rêya xwe dewam kir.

Dema rêwîtiya xwe min têkiliya xwe bi hevalên li Ewropayê jî nebirî. Wêneyên xweşik û diyalogên li ser rêya rêwîtiya xwe jî min bi wan re parve dîkirin.

Ji Qeyseriyê bi şûn de, coxrafya hêdî hêdî dihat guher-tin. Şûna deştên fireh çiya, banî, bax, bostan, kanî û rûbaran digirtin. Gurun bi xwe jî di nav du çiyayan de bû. Piştî ku li Gurunê navberek da, min berê xwe da Eskîbektaşliyê. Eskîbektaşli di-keve bakûrê Gurunê ber bi rêya Sêvazê dikeve û rêya xwe jî çiyayî ye. Li Quluyê û li Gurunê jî



eyam xweş û germ bû. Lê gava ez hatim Eskîbektaşliyê ez qefilîm. Tam yayle bû.

Eskîbektaşli gundekî pir piçûk bû. Xaniyên xwe hema bêje gî xeliyabûn. Ez bi erebê ketim nava



gund. Li nav gund hinekî geriyam, lê wer xuya dikir ku kes li gund tune bû. Gund wek gundekî wêranbûyî û terikandî xuya dikir.

Di dawiya gund de min dît ku mêrikek dîwarê malê çêdike. Min erebeya xwe ber malê parq kir û çûm cem. Mêrik jî gava ez dîtîm ber bi min ve hat û me silav li hev kir.

– Keko ez ji Qonya hatim.

– Bi xêr hatî.

– Li vî gundî kes tune ye?

– Herkesî ji vir bar kir çûn bajaran. Niha sê malbat hene û ez jî muxtarê gund im. Navê min jî Kenan Moroxlî ye.

– Oo baş e, tam hatime şûnê. Vî gundî eleqeya xwe bi Qonyayê re heye?

– Erê berê teqrîben sed salî ber vê çend malbatan ji vir barkirin çûn Qonya Atqafasiyê.

– Ez ji Atqafasiyê me û eslê min jî ji vir e. Te navê Hacesan bihîstîye?

– Erê dizanim. Bi kalê min Mehmed Emîn Axa re problemên xwe hebûne. Li vir hatiye kuştin.

– Rast e. Hacesan kalê min yê mezin e. Ez dixwazim mala wî bi-

bînim û çîroka wî bibhîzim. Di nava wî û Mehmed Emîn Axa de çî derbas bûye.

– Ez jî tam nizanîm. Ama go ra ku qal dîkin, Mehmed Emin Axa dest daniye ser tarlayên çend feqîran û Hacesan jî ew qebûl nekiriye. Ji ber wê problem derketine. Di dawiyê de eskeran Hacesan qurşûn kirine. Zêde ez jî nizanîm.

– Ez jî ewqas dizanîm. Tu mala wî dizanî li ku derê ye.

– Erê dizanîm, dikarî nîşanî min bidî?

– Tamam dibe.


Berî ku em herin mala kalê min yê mezin bibînin, em çûn li mala muxtarê gund me qehweyek vexwar û hinekî sohbet kir. Muxtar go li kesekî emir mezin yê bi navê Kazim Kiliç heye. Ew dîrok, meseleyên vî gundî û çîroka Hacesan baş dizane. Piştî vexwarina qehweyê muxtar ez li nav gund gerandim. Mala Hacesan û cihê ku ji hêla eskeran ve hatiye qurşûnkirin nîşanî min da.

Pişt re bi armanca ku çîroka Hacesan ji Kazim Kiliç guhdar bikin em çûn mala wî. Lê Kazim Kiliç ne li mal bû. Paşê ku ez vegeiriyam Ewropa bi şûn ve



min têkilî bi Kazim Kiliç re danî. Derket holê ku meriyê Kazim jî li gundê me hene. Kazim ji gundê me pismamê mala Simêreş bûye.

Dibe ku li gundê Eskibektaşliyê min zêde kes nedîtibin. Lê



belê gava ez li ber çava digrim ku nîvê gundê me berî 120 sal ji wir bar kirine û hatine li Qonya bi cîh bûne, bibe nebe însan her du gund û herêman dide ber hev.

Eskîbektaşli gundekî çiyayî ye. Ji hêla teknoloji û struktura binesaziyê ve li gor gundê me 50 salî li paş e. Di nav gundiyan wî gundî çî li gund çî jî li derveyî gund pêvajoya asimilasyonê bi dawî bûye. Kes bi Kurmancî nizane êdî. Ew tenê dizanin ku kal û pîrên wan Kurd in. Ji ber

wê yekê dikarim bi dilekî rihet bibêjim, ku ji her hêlê ve hatina me ya Qonyayê ji bo civata me gavekî erênî ye.

Piştî Eskîbektaşliyê ez derbasî herêma erdhejê bûm. Di Elbis-tan, Mereş, Nurdaxi, Hatayê re derbasî Edenê û ji wir jî vege-riyam Quluyê. Gera ku min siftê dixwast ber bi Îngîltêre bikim, bû nesîbê Yaylê.

Çîroka şerê di nav Hacesan û Mehmed Emîn Axa jî ezê di nivîseke din de qalê bikim.



Kravatê sor

Halil Mîrzan Küçükyıldız

Berîvanê dest-pîyê xwe şuştin, porê xwe şêhkir, çentê xwe girt û berî ku derkeve, Fadîme xanimê kir qîrni: “Bê xurinî herî ku? Bi lez lez derdikevî, te ne çayek vexwar, ne jî tiştik xwar!”

– Na etê, ez ê bi ecele me, îro him herrime dibistanê, dûva jî herrime meşê.

– Meşa çi ye?

– Meşa jinan heyê, em ê zilm û zorbazîya li ser jinan protesto bikinî.

– Boyî çi?

– Çima tu nizanî? Bi şev û roj jinan tacîz dikin, pir jin jiber derb û kutên mêrên xwe eciz dibin, hen ji wan tên kuştinê.

– Na çi bikî keça min, teva tiştî wina î bi tirs û tehlûke mebe! Li vir salekê maye. Ger te xwendina xwe teva kir û bûyî parêzer, alikariyê wan bike. Lê tu bi gura min nakî, tu keça bavî xwe yî!..

– Wer neye, ez helbet keça

bavî xwe me. Lê te çima wer got?

– Bavê te jî meraqdarê karê wina bû, tim qala sendîqa û mafên karkêran dikir. Wî dixwast teva meşa bibe. Wî digot “vê memûriyetê dest û pîyê me girêdane, em stuxar kirini” heş û fikira xwe tim li ser siyasete, çep û rastê bû, hevalên xwe yên solcu, devrimcî hebûn.

– Ez dizanim, bavê min şoreşger bû.

Berîvan rabû berva mitfaxe çû. Fadîmê kesereka kûr kişand û di ber xwe de got: “Ka bavê te? Bavê te çi mêr bû, qet ez ji wî eciz, dilşikeştî nebûm, neşîyam.”

Vexta bavê Berîvanê, Rasim Efendi, di dûv mezûnîyata akademîyê, di wezerata malîyê de bûbû memûr hîn bistûdudu salî bû.

Salekê şunva çû, ji gund bi Fadîmê re zewicî. Ew sîyar kir û anî Ankarayê. Ew ji jiyana xwe

razi û kêfxweş bûn. Her havînekê bi sê zarokên xweva diçûn gund, ba malbatên xwe. Fadîmê ji ger û serlêdana gund pir hez dikir. Wê dixwest fors bike, binimîne ku ew jina mudurekî ye. Pozî xweyî li he-wa bû. Qerf, şor, gotinên doralîya ji nebihistinî ve dihat, xem nedikir ku dibêjin, “vê çistikê, vê fortekê, virrekê”. Digot, “ew dexes û pexîlnan ji min diqarine, zikêşî dibine, xema min jî neye, helbet jina mudurekî me, li Ankarê, li payîtextê rutinime. Rasim Efendi ji nav ewqas keçikan de ez girtim, bi min qaîl bû, dile xwe ket min.” Hercara ku diçûn gund xwe çê dikirin, kinc û libasên xwe yên ter baştir, nû li xwe dikirin. Rasim Efendi ji taximê xwe ya laciwert hezdikir, kravetê sorî deqdeqî bi stu xwe de dikir. Fadîmê jî hercarekê digot: “çima sor? Ne baş e.” Wi jî digot: “Sor rengê me ye, sor rengê serhildanê ye, ma sor bi, ya me bi.”

Lê ew kêfa li wan pir neçû. Jiyana bextîyar şûna xwe da bêbextîyê û tarîtiyê. Berê Rasim Efendi bi nixwaşiya giran û bêhavlî, qanserê ket, salik neçû, koma xwe bê bav hişt û mala xwe bar kir çû. Hingê Fadîmê zanî ku

girî û keser ne çare ne. Wê xwe da pêşîya koma xwe, him bû dayîk him bû bav ji wan re. Ew şandin dibîstanan û ew dane xwendinê. Maaşa mêrikê wê hendik bû û helbet bi dewara wan nedikir, wê bi rû de dest bi durinê, hunandinê kir, bi dizikî diçû kar û barê cîranan, bi vî avayî derikî qezencê vekir, alîye destengîyê û kemasîyê bi kesî nenimand.

Fadîme rabû çû li ber makînê dûrînê runişt û bi dengê bilind got: “Te tiştin xwar, Berîvan?” Berîvan ji mitfaxe hat: “Erê etê min du-sê parî nan bi penêr xwarin. Dayê tu ew kilamên te li şîna bavê min gotiyî xatir dikî, du sêka bê!”

– Kilam di bîra min de manê! Him va newexta wê ye.

– Erê etê ez dizanim tu yê dizikî xwebixwe dibêjî, ez qurban daye!..

Fadîmê kesera xwe kişand bi dengekî nizm:

Tu li çiyakî ez li çiyakî

Berf û baranê li min daye, bahoz kurekur

Bûme perikekî tenê li telakî

Kuda herim xwe daye dû min koma hûr

Berîvanê çentê xwe helanî derket çû. Fadîmê di dûva kir barnî: “Keça min miqayeta xwe

be, teva tişteki mebe!” Qimaşek ji erde helanî û kêlên bişkiftî dan ber derzîyên makînê, bi şeqaşeqa makînê re ew jî ket nav xem û xeyalan.

Qirarê seatekê şunva xwe vestîyayî hîskir, xwebixwe got: “Va destê min çima qerimî, pîyê min jî zûva ditevizê.” Berê rabû çû mitfaxê, avek vexwar, bi paqijîyê qail nebû. Kurikan fereqên qilêrî bi serhev kirî bûn. Bihna wê teng bû. Çû oda rûnişkandinê, xwe avêt ser dîwanê, qumandê televizyon girt, qanal qanal li tişteki gerîya. Nişkava programa xeberên zindî bi pêşçavan wê ket. Keçikeka muhabir digot ku meşa jina gêştîyê Kızılayê. Kamêra dan ser qelebelixe. Bi sedan jin û polis li hemberî hev bûn. Bi sedan polisan barîqat danîbûn ser rê û xwe ji erişekê re amade dikirin. Fadîmê bi teleşekê lê nerî. Tirs û xofekê canê wê cirifand. Bi qîrnî “vêê vêê!” got, “pêê va keçika min e.” Berîvan li pêşiyê qelebelixê dawestî bû, heman heman bi henîyê giheştîbû polis. Jinan bi qîrî û bar mudaxala polisan protesto dikirin û slogan diavitên. Fadîmê heman bi eşarp û caketî xwe girt û bazda der. Li Cebecîyê

li dolmişê sîyar bû. Rê jê re dirêj dirêj xûya dikir. Ne dikanî bibêje “zû zû!” Dolmiş hat li Sihhiyê daveştî, şufer got, “polis rêyê girtîyê.” Fadîmê bi teleşekê xwe avêt erde, bi lez bezîya bezîya, ku giheştîya Kızılaya pêvçûn û lihevixistinê dest pêkirîbû. Polisan bi jopan erîşî ser dikir û pir jin bi erdê re di xişxişandin. Polisekî bi porê Berîvanê re girtî bû û ew bi axê re dikişand. Fadîmê heman xwe avêtê ser Berîvanê got: “Loo ew keça min e, ew delala min e. Destên wê medî mal xerawnoo, zalimnoo!” Polisekî got: “Va kî ye? Kêm be herre jinik (defol karî!)” Yekî din bi hemdî xwe li serhev serhev bi jopan li serî û piştî Fadîmê xist û xist bê hesap. Paşê du polisan bi pîyê wê girtin û çengkirin kevîya rê, nav daran. Bi wî surertî Fadîme çû bi henîyê li dîrekî levhayekê ket. Xwest xwe bi lepa kaşke bin dara hêşîn, nişkava ro biderket, herderek bû rohnî. Rasim Efendi di bin darê de bi rûken û bişîrînî peyda bû.

Kravatê xweyî sor û deq deqî, qijqijî di stu de bû, dîsa digot: “Were were Fadîme ma sorbî, ya me bî!”

Fadîmê lê çavnêrî got:

*Tu li wî derî, ez li vî derî,
Lo loo tu ne mêr î tu ne mêr î,
Tu ancax xudanê kravati sor, qelemî kehribar î.
Keça me, delala me bi axê re kişandin,
Ruçikandin ji serî wê porê zerî
Serî xwe helîne, ka tu li ku yî loo loo
Tu ji kê ditirsî ji kê nawerî?*

Nûçeyên şîva gîştikan bûyerên wê rojekê behs dikir. Henan qala jinên terorîst, henan jî qala şîddet, mudaxala polisan a bê emsal û bêoran dikir. Çend keş û jinên binçav bûyî xeber didan, li selt paşîyê jî digotin: “Mixabin jineka li dorê pênce salî jîyana xwe da der, polis lêkolînê dike ku, ka kê ew derb kirîyê, çima kesî ew li bin darê Güven Parkê ferq nekirîyê, çima dereng gîhandine nixwaşxanê.”

Jêrenoteka biçûk:

*Min di hîkayêta xwe da “oran” û “selt” bikaranî, çima ku min ew peyîvanan min ji mezinê xwe dibihîstin. Wek digotin: “Va lawîka naye oranê”, “n’ate oranê”, “selt jî wer nabe (o kadar da olmaz).”
Oran: “Denge, düzen.”*

LÊLÊ

Dr. Bangîn Fayo

Ma we qet meraq kir, ka wateya “lêlê” çi ye?

Gotinên stranekê?

Navê keçekê?

Xwedayekî mîtolojîk?

An jî peyveka ku dema dayikên me diaxivîn bi kar tînin e?

Ma hûn dizanîn dema ku dayikên me dibêjin “Lêlê, keça min a delalê, tu yê li ku yî, were hemêza dayika xwe. Ma we qet meraq kiriye ku wateya “lêlê” li vir çi ye?

Mîtolojiya kurdî, mîtolojiyeke ku ji tevîhevbûna baweriyên çandî û olî yên kurdan ên di dirokê de pêk tê û mijarên wekî afirandina gerdûnê, xweda û xwedawendan, leheng, cinawir û tiştên neyîsîz (heyînên serxwezayê) di nava xwe da dihewîne ye.

Lêlê, di mîtolojiya kurdan de xwedawenda herî girîng e. Li vir em ê dê cara ewil “lêlê” nas bikin.

Xwedawenda Lêlê ya ku di mîtolojiya kurdî de girîng e, pir caran bi mijarên wekî evîn, bedewî û zayokî ve tê pêwend kirin. Taybetmendiyeke din a Lêlê jî ew e, ku giredaniya wê ya bi huner û edebîyatê ve ye. Çîrokên Lêlê gelek caran li ser hêz

û bengîniya evînê ne. Di mîtolojiyê de Lêlê bi xwe jî bingeha çîrokeke evîniyê ye.

Li gor riwayetekê, bedewî û cazîba Lêlê bala keyê xwedawendan Xwarêşger kişandiye û dilê wî ketiye Lêlê. Lê, Lêlê bersiva evîna Xwarêşger nedaye û bûye evîndara Xwedawendayekî din –ya Ahûra.

Lêlê wek Xwedawend tê hesibandin û gelek caran wek jin tê teswîrkirin.

Bandora Lêlê ya di edebîyatê de bi taybetî di helbesta kurdî de tê dîtin.

Gelek helbestvanên kurd li ser bedewîya Lêlê û hêza evînê helbest nivisandine.

Lêlê, di mîtolojiya kurdî de wek sembola evîn, bedewî û hunerê tê dîtin û heta niha jî di çand û hunera kurdî de xwedî cîyekî girîng e.

Sedema girêdayîbûna Lêlê taybetî bi evîn, bedewî û edebîyatê de, ji girîngiya ku kurdan di dirokê de daye şaxên hunerê yên wekî helbest, çîrok û muzîkê tê. Helbesta kurdî bi giştî bi mijarên wekî evîn, hez û xwezayê ve mijûl dibe û nîrxên ku Lêlê simbolîze dike

jî di van helbestan de gelek caran tîn bikaranîn. Di mîtolojîyê de Lêlê wekî helbestvan û hozan tê pekirandin û helbest û stranên wê jî hêla xwedawendên din ve tîn nirxandin.

Evîn, bedewî û bengînîya ku Lêlê nîşan dide, yek ji mijarên ku di helbest û muzika kurdî de gelek caran tê niqaşkirin e.

Wek mînak di vê stranê de:

Çima tu wer dûr direvî?

Ne xerîbê te me, yarê

Dil qazana eşqa te ye

Ez tê de dikelim, yarê

Ay lê lê...

Berxê lê lê...

Dinê lê lê...

Xwestiyê te me

Herwiha di straneke din de:

Lê lê rihê, rihû min î

Tu şêrika emrê min î

Tu şêrika mala min î, rihê min

Bi şev biroj ez xew nakim

Qeymiş nakim te şîyar bikim

Ji eyb û şerman ez dey nakim, rihê min

Bandora Lêlê di çanda kurdî de tenê bi huner û edebîyatê re sînordar nîne. Navê Lêlê, nîha jî li herêmên kurdîaxêv navekî hevpar e û hin malbatên kurd navê Lêlê li zarokên xwe dikin. Wek mînak: Lêlê Şahîn, stranbêj û bestekara kurd e.

Lêlê Xanî, yek ji rewşenbîrên kurda ye, ku bi leqeba Ehmedê Xanî tê nasîn û xwedîyê gelek berhemên wêjeyî yên klasîk wekî Mem û Zînê ye.

Lêlê Êzidî, navekî jineke kurd e û pir caran di nav civaka êzidîyan de tê dîtîn. Wateya vê peyvê “Êzîza Êzidî” ye.

Lêlê Reş- Navekî jineka kurd e. Wateya peyvê “Êzîza Reş” e.

Gelek mînakên din dikarin bîn dayîn.

Nirxên ku Lêlê simbolîze dikin, hê jî ji hêla gelê kurd ve bi nirx, qedr û qîmet in.

Mîtolojîya kurdî, hîn jî ji bo gelê kurd mîraseke çandî û nasnameyê-ke girîng e. Bi taybetî di van salên dawî de, mîtolojî û çanda kurdî ji hêla tevgerên siyasî yên kurd ve dest bi karanîna kir û bi netewperestîya kurdî re hewl hat dayîn ku nasnameyêke netewî bê afirandin.

Di dawîyê de, divê bê gotin ku, cihê Lêlê di mîtolojîya kurdî de ji bo gelê kurd sembola nasnameyê ye. Kurd çîrokên Lêlê û xwedayên din wek beşek ji çanda xwe dibînin û ev çîrok, têkiliyên kurdan bi hev re xurt dike û divê ew hîs bikin ku ewana xwedîyê dîrokeke hevpar in.

ŞÎRET

zimanî te sendûqa xezînê û kumê serî te yê
bi zimanî dayîkê dengke ku ma erd û ezmên xenê
û ewrên reş belevke û faûna û flora dilşad bike
bi zimanî lalê biaxafê ku
me peyv li biharê neçilmisîn
bi zimanî atkê qisa bike ku
me dengî dilî te yî zîz di evînê te bigêhê
peyvên ku hatine ji bîrkirin
vejîn bike ku tehma zimanî te ma te mest bike
bi zimanî anê xwe bipêyîve ku
ma hîsên te xwe bixemilînin û xuya bikin
wek arkelokekî binî peyvan bikola ku zimanî te yî ku di hundirî
tarîx, mîtolojî, ol û folklorê da veşartîyê kişf bikî
qayteneke ji zêr û zîv bi kevneşopî û serkeftinên
xelkî xwe re ava bike ku ma tu werî temê dinê
zimanî dê temê xwe wek hingîve biharê ye
ki hîng derang nebîyê wegere
û
dev ji wan cil û bergên xeriban berde
bi zimanî dayîkê xwe dengke ku ma hundirî te vêsê
û xwebawerîya te bilind bibe.

Seyfî Doğan

Lolo, lorîyên derguşan, parçeka edebîyata bi devkî ye û mînak yek helbestên qut û anonîm in.

Lorîyan pir caran mezin ji bo derguşa di xewêkin distêrin. Lorî bi zirava û melodîyeka nermik tê gotinî. Va ziravayê nermik derguşa rihet dike, derguş xwe ewle hîs dikin û hîn zû dikevin xewê. Lê carna jî mezin wextê bi derguşan şa dibin jî wan ra lorîyan distirên.

Mijarên lorîyan, piranîyên wan li ser zewacan, bext, qeder û li ser rindbûna derguşa ne. Û lorî hen jî vêmanê ne, mezin ji bo deng û awazeka melodîk şorên qewleme didin pêhev û distirîn.

Dîroka lorîyan heta 5000 salî bervê, heta sûmeran û babîlan bi qutayî heta Mezopotamyaya qedîm tere. Pisporê zimanê sûmeran Samuel Noah Kramer, nivîseka mîxî ji ber zayînê 2000 salî xwand û ferq kir ku ew lorîkeka jinekê li ser lawikî xwe sitrayî ye. Navê lêwîk Ururu ye û

li lorî çaranîyê xwe siftê va ya ye:

"Ururu bi kilaman gir be

Ururu bi kilamên min mezin be

Mîna darê îrîna koka xwe bavê

Mîna giyayê helîzê dirêj be"

Li Îngilîstanê li muzexaneyayê bi navê *British Museum* jî lorîka li ser tableta gil hatî nivîsî û 4000 hezar salî ji babîlan mayî heye.

Lorî ji bo derguşa ji xewa ewle û aramî bêtir jî kar û faydên xwe pir in. Derguş bi lorîyan, bi mezinên xwe va dikeve tekilî û li navberê wan girêdaneka mezin destpê dike. Bi vê girêdanê jî derguş xwebawerîyê dest xwe dixe û ew xwebawerî ya jîyana derguşê gîştîkê bandor dike û rê dide. Derguşên bi lorîyên xwaş û melodîk mezin dibin, qareqtera wan jî fodil û dilgerm diwin.

Lorî li ser zimanan jî tesîra xwe pir e. Derguş 6 mehanî şûva êdi şoran giran giran ji hev derdexin. Bo we derguş çiqas lorî guhdar bikin ewqes pir gotin dikevin

heşan. Gotinên wextê derguşî û kurikbûyinê dikevin heşa, tû caran nê ji bîr kirin.

Kurikên me, li dibistanan û li ber televîzyon, li ser telefon, li nav hevalan tim zimanên cûda deng dikin ji bo wê jî adaptasyona kurdî hîn zor dibe. Yê bi lorî û kilaman kurdî mezin bûnî, kurdî hîn zu fêr diwin û deng dikin.

Pedagog û psikolog jî pir caran li ser wê mijarê dadistên û fikirên xwe jî mîna hev in. Buket Yavuz, jî gundê Axlera Jêr e (Bala) û nêzikî 20 salan li Swêdê pedagog e. “derguş şeş mehanî şûnda çi bihîstîye qeyît dike û zahrê devî dê xwe dike. Ji bo wê derguş dema lorîyan bi kurdî guhdar kirin wextê mezin bûn yê kurdî hîn rihet fahm bikin û deng kin.”

Cemile Erdem ji Burunsuzê ye (Heymana) û li Danîmarkê pedagog û pêşvebira zimanî ye.

“Derguş hîn ku nehatîye dunyayê denga dibîhise. Hat dunê bi şûnda jî dengê binheşa kevin û sal bi sal fêr be. Her lorîk jî bo dergûşê kar û qezencek e.

Derguşên lorîyên kurdî guhdar kirin ji alîyê zimanê xwe ji yê din sê gava lê pêş in.”

Serdar Ünlü ji gundê Kehya (Beşqawaqê Mezin - Cihanbeyli) û li Tirkîye pisporê psikolojîyê ye. “Lorî wextê bi kurdî hatin xwandin derguşa fonolojîya kurdî bihewise. Bin heşa zirave, devok û gotin ên qeyît bin. Bo wê derguş hem kurdî qolê bihewise hem jî aqsan yanî devoka xwe vêkemayî û rast be.”

Li gundên me jî pir lorîyên herêmî, xas û taybet hene. Lorîyên gundên me pirên xwe li ser zewacê ne û hene xwe jî bi şorên qewleme çêbûne. Min ji we ra çend lorîyên qedîm ji gundên me berhevkirin niha ez ji we ra ewna binivisînim.

Ez keçikê xwe nadim der

Qeling were çalêk zer

Xelat were hespekî nêr

Dîsa keçikê xwe nadim mêr

Xelkê Jêr

Keçika mala ber derî

Topel bir şara serî

Te dî navê keçikê me naçê kirin

Kes lî nawê xwazgincî

Gundê Omê

*Were ber mala me cûcê
Xweli li ber xwe quç ke
Keçikêk hat ac ke
Lawikêk hat paç ke (Omera)*

*Xewer medin cîrana
Ez çûm dizîya mercana
Şeqnî kete pençera
Lo lo dengî xwe mekin
Dengê we here cîrana*

(Çîmena Mezin)

*Kî bi keva
Kal pîr bi gundî Omê va
Sim bi Fatê Mamê va
Elê Xantê bi Silê va
Memik bi Hore va
Çi çarê bi keriyû pez va
Kewanî bi meşk kilora va
Ran pêş textî sîlê va*

Gundê Omê

*Lo lo lo lewende
Dak eşîr bav gawend e
Bas bazik çi rind e
Verşîkin me çavînî*

Caleb

*Lokis diwem li yan e
Heso şivanê mîyanê
Gur bi pezî me ketî
Sibe çûm ba xortan e
De merx e merx e merx e
Mî mexal hat bû berx e
Bûka me ji nav derxe
Yê din jî arekî bi berxe*

Beşqewaxa Mezin

*Keçikê mala weng dawin
Şîr dixwin gemar dawin
Koka gulî zer dawin
Mêrke xwe teter dawin*

Omera

Mast

Mehtab Îdelî

Mastê ku bi meyandina ji şîrê kelandî û tazmiq (havên) tê çêkirin, di xweyî kirina mirovan de yek ji xwarinên herî kevnar e û ji dema hînbûna xwedîkirina ajalên de maye.

Îcar mast çing derket holê û cara yekem çing hat meyandinê?

Ger ji bo çêkirina mast pêwîstî bi mastê din hebe, hîngê di dîrokê de mastê yekem, çing hate meyandin? Li ser vê mijarê gelek gotin hene:

Pliny, fîlozofê sedsala yekê piştî BZ yê Roma, destnîşan dike ku neteweyên barbar ên kevnar dizanibûn ku şîr çing bigihînin hevgyrtinek tîr. Ji ber ku, wê demê şîr zêde di hundirê yarên heywanan de diparêzin. Bakteriyên ku di van heywanan de têne dîtin, şîr di germahiyek diyarkirî de tîr dikin. Ku ew jî di encamê de tiştê îroyîn wek mast derdixe holê.

Li gor hinekan jî mastê pêşî ji axa hêlîna mêrîyan hat çêkirin. Lê paşê hat dîtin, ku ew ji bo tenduristîyê ne baş e. Piştra bi rêbazeke din, ya bi hêkên mêrîyan hat ceribandin. Ji bo ku di warê naveroka hêkên mêrîyan de vegirtina şîr peyda dibe, bi vî awayî mast di demeke kin de dihat meyandin.

Ji ber vê yekê, demjimêra meyandina mastê yekem ji yê îro cuda ye.

Li gor gotegoyeke din jî, mast jixweberê hatiye meyandin. Di tazmiqê (havên) mast de bakteriyên wekî asîda laktîk hene û ew şîr zû dimeyînin. Heman bakteriyên asîda laktîk û bakteriyên bi taybetiyên wan ên dişibin hev, bi serbestî li hewayê belav dibin. Ji ber vê yekê, mastê yekem, bi vî awayî di bin pêşengiya bakteriyên di hewayê



de hat meyandin û piştra bala mirovan kişand.

Hinekan jî, bi dew genim bi guzikê qajê hewl dan, ku bi awayên wekî heman encamê bi dest bixin.

Herwiha heger di malê de tezmîq tunebûya, di tasekê de panzdeh nok û qedehek şîrê kelandî tevlihev dikirin û şevêkê dinuximandin û bi vî awayî tezmîq bi destdixistin. Û pê mast dimeyandin.

Di dawîyê de jî, bi tevlihevkirina piçek mastê berê di nav şîr de rêbazek rast a fermentasyona mêst hat dîtin.

Îcar li dinyayê kê mastê yekem çêkir?

Li gorî hinekan, hebûna mast ji beriya miladê ve dest pê dike. Û tê texmînkirin ku mast cara yekem berî miladê di navbera salên

5000 û 4000 deli Mezopotamyayê hatiye çêkirin.

Berî wê, di 6000 BZ de, di nivîsarên olî yên hindî de behsa feydeyên xwarina hilberên şîr yên fermentê li ser tenduristîya mirov tê kirin. Di çavkanîyên hindî yên kevnar de ji tevliheviya mast û hingiv ra “xwarina xwedayan” tê gotin.

Di kevneşopiyên farisan de tê gotin, ku sedema dirêjîya emrê Bîrahîm, pîrxwarina wî ya mêst bû.

Di mutbexa kevnar a Yewnanîstanê de tiştêkî bi navê “oxygala” ku dişibe mastê dihat çêkirin û tê gotin, ku bi hingiv ra dihat xwarin.

Di hin çavkanîyan de jî tê gotin, ku aşpêjên împaratorîya Babur (Mogolan), mast, bi tovên xerdel û darçîn çêdikirine.

Qralê Fransayê François I gelek caran bi emelê/vîrikê dikeve û bi mastê ku ji alîyê mutefîqê xwe yê tirk ve hatibû pêşniyarkirin tê dermankirin.

Dû ra, di sala 1542an de, ji aliyê François I tê Rojavaya Ewropayê. Ji Ewropayê dest pê dike û li seranserê cîhanê belav dibe.

Li gorî hinekan jî, dahênerê mastê yekem tirk in. Lê her çiqas

dahênerê mastê yekem tirk bin ji, bulgaran patenta wê girtine.

Xwendakarê bijîjkî yê bulgarî Stamen Grigov, tenê di sedsala 20an de karîbû bakterîyên ku di mast de têne dîtin nas bike (*Lactobacillus Bulgaricus* û *Streptococcus Thermophilus*).

Bandorên erênî, yên mîkro-organîzmayên mîkrobiyotîk ên li ser tenduristîya mirovan yekem, car di sala 1908an de ji hêla lêkolînerêk rûsî Elie Metchnikoff ve tê peşînyar kirin. Metchnikoff, dibê, bakteriyên bikêrhatî yên di mast de, sedemê dirêjiya emrê gundiyan Bulgar in. Û gor Metchnikoff, ev bakteriyên ji ber, ku asîda laktîk çêdikin û tahma tîrş dide mast, emrê gundiyan dirêj dikin. Bi vî awayî mast li

cîhanê popular bû û di dermanxaneyan de wekî dermanek, ku bi feydeyên xwe yên tenduristiyê tê zanîn, hate firotinê.

Weke her civakekê, di nav cîvaka kurd de jî, mast xwarineke bingehîn û navder e.

Ji ber ku piraniya kurdan debara xwe bi sewalkarî dikirin, vê yeke, ji hêlekê de bandoreka mezin li jiyana wan a aborî û ji hela din ve jî li jiyana wan a çandî kir. Her diçûn ku, ew awayê jiyana kevnoşop bi xwe ra dibirin.

Bêrîvanî, ji çûyîna bêrî û doşandina pezan ra tê gotin. Ji jinên kurd ên ku diherin bêrîyê û pêz didoşin ra jî “bêrîvan” tê gotin.





Kokê/qurmê peyva bêrîvanê jî ji “bêr” tê. Bêr jî, bi hewşa beyaran ya ku pez ji bo dotinê dixine navê ra tê gotin.

Keçik û jin bi kêfxweşî li pey hev, satil diavêtin ser milên xwe û diçûn bêrîyan, ku pez bidoşin. Hinek diçûn zozanan, hinek diçûn mexelan, hinekan jî li mal didotin.

Mezinên me digotin: “Em berê bi peyatî, bi hespan an jî bi erebeyên hespan diçûn yaylan (zozan). Paşê dema ku traktor û otomobîl hatin îcadkirin, em bi wan diçûn û dihatin.

Yekê ji me serê pêz digirt û yekê jî didot. Li hin gundan jî, serê pêz bêyî ku bê girtin tenê ji alîyê kesekî ve dihat dotin. Ji ber,

ku pez bi wî awayî hu dibûn û heta ku werin dotin aram disekinîn. Ji ber, ku bizin li gorî pez bi hêrs bûn, pêşî dihatin dotin. Ji ber vê yekê digotin; “bizina îçelî”. Dû re şîr diparizîn, dikirin elban, kûz, tenekên dev girtî an jî bi kovikan berdidan bîdonan û dibirin mal ê. Hinek jî ji xwe ra digirtin û nanê sele dikirin kovik, berî ku şîr sar bibe li bêrîyê dixwarin. Yên mayî jî li ser argûnan, di biroşên paxirî de dihat germ kirin. Ji hinekê mast, ji hinekê rûn û ji hinekê jî penîr dihat çêkirin.

Pez, heta paşîya meha adarê dîza. Di vê navberê de pezê ku nû zayî, li mal dihat dotin. Bi wî şîrî ra digotin, “şîrê zêç/şîrê zak”



û ji wî şîrî jî firî/firo dihat çêkirin. Paşê jî, paşîya meha nîsanê heta dawîya gulanê pez dibirin yaylan ku berx hinekê mezin bibin. Piştî wê dîsa dest bi dotina pêz dikirin.

Firî/firo: Şîrê zêç (şîrê zak) bi şîr ve tevlihev dikirin, heta tîr dibû dihat kelandin. Dû ra sar dikirin. Wekî mast an jî penêr dihat xwarin.

Mast: Şîrê parzinkirî û kelandî, gavekê didin sekinandinê. Paşê di zerkekê de hendik şîr teve têzmiq dikirin, tev didan û teva şîr dikirin û ser dinixumandin. Şevê di ser ra derbas dikirin, sibê jî ser vedidan û dixwarin. Helbet li pêşîyê, cihê herî baş ya mast, qemaxê/toyê li ser dihat girtin.

Nizanim, ma xûşk-birayên ên ku kurd in û li ser qemax şer nekirine hene?

Mast ji şîrê pêz, mangan, bizinan, cemûsan (gamêşan) çêdibe.

Bi demê ra, awayê xwarina mast bi pirawayî bû.



Ji bo vexwarinê mast bi avê ve tevlihev dikirin, jê dew/çe-qelme çêdikirin. Dew ji hêla tenduristîyê ve gelek bi feyde ye. Li germa havînê, ji bo ku ma herareta wan bitemirîne, bi zar xwe de berdidan û hundirê xwe pê sar dikirin.

Carinan bi tenê mast, carna jî hinek av tevê dikirin û nanê selê nav mêst de hûr hûrî dikirin, tev didan û dixwarin. Ji vê ra jî digotin, “fîrd”.

Mast, sîr, xwê tevlihev dikirin û jê sos çêdikirin. Ew sos jî li ser xwarinan dikirin.

Mast, sîr, xwê û tevlihev dikirin û xiyar hûr dikirin û tevlî sosê dikirin. Jê ra digotin, „cacix/çênca sîrimê.”

Mast, dan û av tevlihev dikirin û pê şorba mehîrê çêdikirin.

Mast bi danê hatiye kelandin ve tevlihev dikirin û li ber ro hişk dikirin û jê terxane çêdikirin.

Mast, sîr li ser nanê selê hûrkiirî dikirin. Li ser wê jî rûnê heliyayî pê dirijandin. Jê ra digotin, sîrerûn.

Û gelek tiştên din ên bi vî rengî.

*Mastê ku zêde şûji tê de hebe û li cîhekî germ were hilandin, zû

tirş dibe. Ew jî, dema bakterîyên mast çêdikin pir zêde bûn, dibe. Ew çêjeke nexweş didin mêst û tirş dikin û mast peqpeqokan dide. Dema mast tirş bû jî nema tê xwarin. Ji ber wê jî mêze dikirin mast şûjiya xwe pir dibe û ji bo ku zêde tirş nebe, ew dikirin nav parzûnê û bi derekê de bidardixistin, ku ma şûjiya xwe here û zêde tirş nebe.

Li ba kurdan bi piranî jî mastê pêz navdar e. Bi taybetî mastê hêla qerejdaxê wekî mastê Amedê yê cîngilê (satilê), mastê Sêrtê yê cîngilê (satilê) û hwd.

Mastê sur/şor: Şîr li makîne dixistin. Şîrê yaban bi tazmîqî ji mêst hendik şîr tevê dikirin, tev didan û teva şîr dikirin û ser dinixumandin. Şevêk di ser ra derbas dikirin. Sibê ser vedidan û dikirin parzinê, dû ra dikirin navbera du kevirên pan, şûjiya xwe darivî şûva, bi mastî bi rûn ve tevlihev dikirin. Dîsa dikirin parzinê û dikirin navberê du kevirên pan, heta ku hemû şûjiya xwe darivî. Dû re xwê tevê dikirin û dikirin qêwirme û derî qêw dikirin. Li taştê, li ser nêr didan û dixwarin.

Dew: Mast û av tevlihev dibe, an jî ji şûjiya ku ji lihevexistina

çîgê rûn jê hatiyê veqetandin çêdibe. Carinan bi vê avê şorba mehîr dihat çêkirin.

Keşk/Çortan: Tazmiq (1-2 kevçî mast) hendik şîr tevê dikirin, tev didan û teva şîrê yaban dikirin û ser dinixumandin. Şevêk di ser ra derbas dikirin. Sibê ser vedidan û dikirin parzinê dû re dikirin navberê du kevirên pan, ku heta şûjiya xwe darive. Dû re xwê lê dikirin. Perçe perçe dikirin. 1-2 hefteyan li ber ro (tavê) hişk dikirin. Di rêbeza din de jî piştî, ku dew dihat germkirin (di vê navberê de dihat xwêkirin) dû ra dihat parzinandin û perçe perçe dihat hişk kirin.

Ew rêbaz him nirxa xwarinê ya mêst zêde dike, him jî di heman demê de bi praktîkî di xwarinên wekî şorbe û nanbir (rişte) de jî tê bikar anîn.

Carina jî mastê hê şil, tevli danê rakelandî (heşandî) dikirin û li ber tavê hişk dikirin û dikirin terxane.

Givrik: Berê ji bo ku dermanê penêr tunebû, berxeka virinî ya ku têr şîr mîtiye, serjê dikirin û dişuştin. Dû ra şîlavê berxê jê digirtin. Hinek xwê, dan, bulxur, nog, hêjîr, şekir tevê dikirin



şûnda dikirin şîlavê û girê didan. Heta ku tirş û hişk dibû dihat parastin. Dû ra tevli şîr dikirin û penêr dihat bidestxistin.

Penêr: Parçek ji givrikê diavetin nav şîrê germkirî. Çend saetan şûnda, wexta ku şîr gilebigile dibû, ew dikirin parzinê û parzin girê didan û dikirin navbera du kevirên pan ku av şûjiyê xwe biarive. Dû-sê saetan şûnda penêr ji parzinê derdixistin û di testekê de, bi kêrê çarkoşe dihat birrîn û xwê dikirin. Şûjiya wî jê çûyî dikirin bidonan dikirin sûravik. Li cihekî hênîk ê malê, mîna jêrzemînê, dihat parastin û zivistanê dihat xwarin.

Hinekan ji wan, ji nav şûjiyê derdixist ava xwe daravî şûnda



hûrik hûrik dikirin û diabandin qewirman.

Çolik/toraq/Lor: Piştî ku mast bi avê ve tevlihev dikirin, wek dew, piçek tirşî, wek givrik, leymûn an dermanê penêr dixistin nav wê. Dû re dikelandin heta ku bibe penêr. Sar bû şûnde, dikirin parzinê heta ku şûjiya xwe diarivî. Şûjiya arivî li cihekî hênîk de dihat parastin. Bi vê ra jî digotin, lorên ji dew.

Dû re, makînen şîr derketin şûnda şîr li makînan dixistin. Çîg/xav ji ji hêlekê de, şîrê yaban ji hêlekê de dihat. Şîrê yaban dermanê penêr tevê dikirin û dema şîr gilebigile bû ew dikirin parzanan û dikirin navbere du keviran ku heta şûjiya xwe çû. Dû-sê saetan şûnda penêr ji parzinê derdixistin û di teştekê de, bi destan li hev dixistin, hûrik hûrik dikirin. Dû ra bi qewirmê de (paşan kûz, bêdon) berdidan û rind diabandin. Li cihekî hênîk ê malê, mîna jêrmînê, bi qûmê dihatibû pêçandin û zivistanê dihat xwarin.

Lor şîrîk: Şîrê qetî hinekî din dikelandin heta ku bibe penêr. Gava sar bû, dikirin parzinê heta ku av û şûjiya xwe darivî, penêr ji parzinê derdixistin û teze dixwarin.

Li gelek herêmên Kurdistanê gelek penîrên ku dişibin hev û bi awayên cuda tên çêkirin hene.

Mînak:

Penêrê bisîrik (penêrê Wanê):

Ew penêr, bi tevlêkirina giyayên teze yên ku biharê ji çiyayan tên berhevkerin, yên mîna sîrik, hêliz û ji şîrê pez, bizin, mangan û ji havên tê çêkirin.

* Li Wanê jî havên bi vî şiklê çêdikirin. Şîlavê hişk dikin dû ra dixin nav avê, şeb, şekir, xwê, qerenfil, darçîn (bo ku ma bîhna wê xweş bibe) tevê dikin û tirş bû şûnda bi kar tînin.

Penêrê Qersê (grayyerî) : Ji şîrê mangên çêrê çêdibe. Penêr, di qalibên hevîrkerinê de û herî kêrî meş mehan di torbeyan de û li cihekî hênîk de tê hiştin. Rengê wî zer e û qulqulkî ye.

Penêrê yaran yê Erzînganê:

Ji şîrê pezê karaman yê spî çêdibe. Û di yarên bizina gil de tê veşartin. Peynîrek rûnî û spî ye.

Penêrê Riha: Ji şîrê herêmê Qerejdaxê çêdibe. Penêrekî sûravk e. Ew pir şor e û şiklê gogê ye.

Penêrê Amedê (penêrê kezî):

Li herêma qerejdaxê bi şîrê dawer û pezan çêdibe. Penêrekî sûravk e. Rengkremî, spî an jî hinekî zer

e. Ew dikare bi destan bi şiklê têlan were veqetandin, qayîşok e û xwedî xuyaniyek bîrçok e.

Rûn: Mast di meşkê de dikeyan û ew dibû dew. Dû ra rûn bi ser diket. Kêşê qatixê xwe pir, rûn di fiçiyên darîn ên mezin de dikeyan. Rûn dikirin parzînan dew bi bîni diket. Rûn ji parzînê derdixistin û dişûstin. Heta derengî dikirin yarên (bi piranî yê bîzînan) paşê elbên darînê û dû ra ji tenekên bi qapax derketin şûnda dikirin wan. Bi vî rûnê ra rûnê nivîşk tê gotin. Tortê binî parzînê mayî ji qozî dikirin û dixwarin. Ji bo ku ma rûn tarê nehere(xera nebe) siftê dihelandin, sar dikirin, xwê dikirin û dikirin yarên ji postê bizîna reş. Bi wî rûnê ra ji rûnê helandî/ tewaş tê gotin. Wek rûnê zivistanê dihat bikaranîn.



Piştî derketina makînên şîr, şîr li makînan dixistin. Çîg/xav ji ji hêlekê de, şîrê yaban ji hêlekê de dihat. Çîg dicivandin hev, lihev-dixistin û dikirin rûn. Dişûştin û hinek jê xwê dikirin, dikirin tene-ke, bidon û feraqên dev bi qapax. Hinek jî bê xwê dihat hilanîn û xwarin.

*Pêdivî ye ku rûn bi baldarî we-re şûştin, da ku ji dewê tê de were pakij kirin, wekî din ew ê ji zû de xera bibe.

*Serê salê, binê salê
Xwedê şîr û mast
dew û penêr
nivîşk û to
rûn û tewaş
û berxekê bide wê mal ê.*

Mêrî: Mûrî, morîstang.

BZ: Berî miladê

Fermentasyon: Meyandin

Îçelî: Çipçipokî.

Elb: Firaqekî ji dar e.

Kovik: Mastêrk, kov

Qêwirme: Postê heywanan,
eyar, avrênc, pîst.

Tort: Xavikê penêr, şîr, rûn e.

Not: Wenê ji medyaya sosyal hatin girtin.

QUTO

kesî wextê xwe yê
aşqê tune
dan û sandin

du kes
monolog
civat

bayî bakûr
berf da ber xwe
li ber diwêr berhev kir

bayî biharê yî şên e
çûçikên bi dilî xwe nefîrine
rojê bêtîne

derewên
li destpêkê
belaş in

Seyfi Doğan

QERFO

yarê dilî min
germ nekê
qet nebe agireki xwe dadim

te serî xwe
kire ber xwe
tu stêrkan nebînî

ji bo ku rojê bibînî
zehemetê xwe
serî xwe berjor hilde

bê ahengên
rengan
wêne boyax dikê

me ahêngê
rengan xelîya fehm bikira
em ê nuha li çîhe din bûn


müzeyên me yên
mîtolojîk hebûna
me yê xwe baş fehm bikira

Seyfi Doğan

99 GOTINÊN

Albert Einstein

wergera ji zimanê almanî: **Nuh Ateş**



24. *Şayed* Xwedê dinya *çêkiriye*,
makxema wî ya herî mezin
bêşik ne ew bû ku wî wer
çêbike da ku ku em bikanin wî
fehîm bikin.
25. Berî her tiştî gerek e ku meriv
li hemberî xwe rexnedar be.
26. Hunerkariya mamoste ya
herî girîngtir, peydakirina
xweşhalîya ji bo *çêkirin* û
naskirinê ye.
27. Kesê ku *êdî* nikanibe heyret
bime û di hurmetkarîyê da
xwe wenda bike, ji alîyê ruhî
da *êdî* mirîye.
28. Bergeha pir merivan biqasî
daireyeke ku nivêşkêla wê sifir
e. Û ew wê wekî ditîna xwe
binav dikan.
29. Dem ew e ya ku meriv li ser
seatê dixwîne.
30. *Întibayek* wer li ser meriva *çêdibe*
ku bingeha fîzîka modern li ser
gumanîyan hatiye avakirin, ya
ku hemahema wekî kenê pisin-
gekê ye ya ku qet li wira tune.
31. *Şayed* ku kesek bi hezkirî li
hemberî muzîkekê bikane
bi rêzûpel bimeşe, hîngê wî
mejîyê xwe yê gir tenê bi *şasî*
helgirtiye, ji ber ku mêjîye
hestiyê piştê têra wî dikan.
32. Em di demeke weha ya têr hecet
û armancên tevlihev da dijîn.
33. Zanist bê ol sistûpist, ol bê
zanist kwîr e.
34. Ya herî giring ew e ku meriv
dev ji pirsînê bernede.

35. Hinek mêr bitûnî jîyana xwe hewldidin ku hebûna jinê fehmbikin. Hinekên din jî bi tiştên hindik dijiwar nimûne bi teoriya rêlatîvîtet va mijûl dibin.
36. Berdewamîya geşbûna zanistîyê li qonaxa dawîyê reveke herdemî ji ber heyretmayînê ye.
37. *Pere* tenê xweperestîyê dikişîne û her tim bo *îstismarê* jî rê bi derdixe.
38. Mezintirîn *îcadkarîya* hişmendîya insanan? - faîza faîzê
39. Xwedê bi zehmetîyên me yê matematikî ra eleqedar nabe. Ew bi avayê empirîk yanê bi tecrubeya entegre dike.
40. Dibistan divê hergav ji bo wê hewlbide, sewa ku merivê cîwan wê wekî kesayetîyeke lihevhatî biterikîne, ne wekî pîspor.
41. Tu kevş û pêşveçûnên mezin tunin hetanî ku li rû dinyayê zarokekî nebextiyar hebe.
42. Nasîna pîrsgirêkê girîngtir e ji nasîna *çareserîyê*, ji ber ku tam teswîrkirina pîrsgirêkê digîhîne *çareserîyê*.
43. Eger fikirek di destpêkê da diji rast dengvenede, hingê bo wê hêvî tune.
44. Kî ji bo meseleya xwe sadik nebe, nikane bipê ku yê din wî bihesibînin.
45. Eger piranî ji ber kinc û navmalîyên xizanîyê *şerm* bikin, *çiqas* zêdetir divê em ji ber raman û dîtînen belangaz yê cîhanî *şerm* bikin.
46. Ji berêberê da bingeha piranîya gotin û kirinê *însanan* tirs yan nezani bûye.
47. Meriyên bîrkanî pir kêmbirekûpêk in, yê birekûpêk kêmbîrkanî ne.
48. Yê ku jîyana xwe û ya hemcînsen xwe bêwate hîs dike, ew ne tenê nebextiyar e, qet ne jîndar e jî.

Berdewamî heye

TÛRİKÊ XEMAN

Xizan Şîlan

ez

rûpelên pêşeroja reştarî û nediyar
bêyî ku vekim û biqelibînîm
bi melûliya awirên şil û hilmgirtî dibînîm
dixwînîm
û şirove dikim
kekela dilê helbestên perpitî
di berika giyanê xwe yê pînekiri de
digerînîm
siya tenêtiya odeya sar
bi agirê henasa xwe ya fetîsok
germ dikim
ji kortika çavên reşbelek
rondikên melûl dilop dilop
diniqutin
li mîrata bêxewiya şevistanan
balîfa ber serê min
nalenal e
hestên mirineke bêwext
xwe li stûyê xeyalên şîrîn
alandiye
laşê rojên keskeşîn
bi kirasê kul û keseran hatine
nixumandin
kêlên goristanên bêxwedî
xwîn vedirişin
qefesa darbestên cendekan ji şerman
diqelişe
kefenê spî di hêrsa xwe de
vediçire
guregura reşewran
nifir û naletê li gunehkaran

dibarîne
hîqehîqa kenê gewriya şevbihêrkan
cemidî
dara biharên hesretê pelên şên û şeng
weşandin
bêhna kulîlkên xwezaya rengîn
çilmisîn
movikên piştî demsalên rûgeş
di qirçe qirça xwe de
şikestin
dîwarê qencî û heqîqetê
hilweşiya
tovên hezkirin û bêrikirinê
li nav toza heyaman
tarûmar bû
qayika bextewariyê
li qeraxên pêlên bayê felekê
asê ma
keskesora derûniya xewnên rût
li qedera eniya xwe
reş girêda
demjimêr
di qêrîn û hawara dayikên neçar de
rawestiyên
çirûskên şewqa agirê eşqa nûranî
vemirîn
dinyaya virek
tûrikê xem û derdên xerîbiyê
li qolincên tevîzî
barkirin
sebira bêdengiya salên têkçûyî
di rayên hinavên min de
dengvedidin

Îdeolojîya namûsê

Windakirina namûsê û xwîna di navbera du eşîrên kurdan de

Prof. Hacı Akman

Weke helwesteke giştî, îdeolojîya namûsê di civaka kurd de xwedî kevneşopîyeke kevnare ye, her çend ji bo piranîya kurdan ew ê ti carî negihêje bicîhanîneka (sepandîneka) konkrêt û di wê helwestê de veguhere çalakîyê. Ji alîyê din ve, ji bo yên din, îdeolojîya namûsê ji komê helwestên pasîf wêdetir tê wateya, di serî de di rewşên ku malbat an eşîr hîs dîkin ku namûsa wan tê tehdîdkirin, an jî bi vî rengî û heya radeyekê tê bînpêkirin. Tolhildan pêdivîyek e ku rûmet were vegerandin. Ev gotar dîyar dike ku çawa bûyerek tesadufî têgihîştinên du eşîran ên namûsê tê, û çawa heman bûyer di dawîyê

de dibe sedem ku partîyan bi rengekî pir nebaş bi hev re têkilîyê daynin, heya ku bi şerekî trajîk ji bo jîyan û mirinê bi dawî bibe. Eşîra civaka kevneşopî ya kurdan ji eşîran ku ji çend rêzan pêk tê. Ji alîyê dîrokî ve nasnameya eşîrî ji bo koçeran ji bo kurdên niştecihbûyî girîngtir bûye, lê heta îro jî girêdana eşîrtîyê gelek watedar e. Di civaka kurdî ya kevneşopî de, eşîr yekîneyek civakî, aborî û siyasî temsîl dikir ku ji bo saxbûna eşîrê dilsoziya di navbera endamên eşîrê de girîng bû. Eşîr bi giranî ji malbat (kes û kar, xizm) û rêzên malbatê pêk dihat, her çend eşîrên ku li gorî prensîbên din hatine avakirin jî hene. Lêbelê, David

McDowell (1998) dibêje ku di çarçeweya kurdî de, êl bi piranî li ser têkelbûna girêdanên xwînê (pîwendîyê xûnî) û dilsozîyê ava bûye (White, 2000:18). Ev awayê rêxistinê wekî faktorek ewlehîyê xuya bû ku dikare berdewamîya eşîrê di pêşerojê de misoger bike. Eşîr li ser deverêk dîyarkirî hukim dikir, ku her çend ji hêla fîzîkî ve nehatibe veqetandin, lê dîsa jî wekî aîdê eşîra navborî dihat hesibandin. Hate gotin ku kurdan tu carî nekarîne girîngîya rêxistinbûna sîyasî ya li derveyî civaka eşîrî bibînin. Berevajî vê, cîhana derve, ger rasterast destwerdana karên navxweyî yên eşîrê nekira, dikaribû kêmkirîng xuya bike.

Eşîra ku bi mînyaturê dinyayê dihat hesibandin, sînorên cîhana derve dîyar kirin û xêz kirin. Dibe ku xuya bibe ku berjewendiyên eşîrên kesane piçekî pir caran li ser berjewendiyên hevbeş ên kurdî û neteweyî hatine girtin û dixuye ku "têgihîştina nexşeyê" ya kurdan tu têgehek dewletî ya serekî nedihewîne, lê di berjewendiyên wan û yên herêmên din de sînorkirî ye. Di hin çarçoveyên dîrokî de tê îdiakirin ku sîstema

eşîrî bûye sedem ku kurdan tu carî nekarîye dewleta xwe ya kurdî ava bike. Yek ji kesên pêşî ku vê yekê tîne ziman Şerefexanê Bitlîsî ye ku di sala 1597an de yekem dîroka kurdî bi navê Şerefname bi zimanê farisî nivisîye. Şerefexanê Bitlîsî ji sirgûnîya xwe îşaret bi gelek nakokîyên kurdan yên navxweyî dike û ji wan dixwaze ku li hev bikin û bi hev re li dijî dijmin şer bikin. Orijînal û destnivîsa van belgeyên dîrokî îro li pirtûkxaneya zanîngehê li Oxfordê (Bodleian) ye û bi çend zimanan, erebî û tirkî jî di nav de, hatiye wergerandin û weşandin (Bozarslan, 1990).

Têgihîştina kevneşopîya kurdan a cîhanê bi dilsozîya bi eşîrê re, ku di heman demê de bextewarîya takekesî jî garantî dikir, pêk dihat. Di nav civateke eşîrî de eşîretî hebûna mirov wek kes – û wek kurd – tê rawekirin. Di serdemên berîya 1920an de rêxistinbûna di nav civakên eşîran de pêkhateya kevneşopîya civakî ya kurdan bû. Ji salên 1920an heta îro ku hê jî axa kurdan di navbera çend dewletan de hatiye parvekirin, her çendî ku di vê demê de pergala eşîrî rastî guhertinên

mezin hatibe jî, gelek kurd dîsa jî dê li nasnameya eşîrî û malbatî vegerin. Divê dîyardeya eşîretî di ronahîya têkoşîna kurdan a ji bo mafê axê - û nasnameya kurdî de bê fêmkirin. Li hember vê rewşê, mirovan cîhana li dora xwe hem ji bo hebûn, hem jî li ser nasname û azadîyê - sê pêkhateyên bingeîn dema ku dor tê ser aîdîyeta neteweyî, dihesibînin.

Di nebûna dewletek cuda de, û garantîyên ku pir caran ji girêdanbûna dewletê peyda dibin, ev hewcedarî di nav tora xizmtîyê de ya ku eşîr temsîl dike tê xwestin. Li ser girîngîya dîrokî ya sîstema eşîretî, û çî girîngîya eşîrê ji bo ferdên kurdan îro heye, hîn jî nêrînên cuda hene. Têgîna eşîrê bi ihtîmaleke mezin li gorî kê wê pênase dike û di kîjan çarçoveyê de tê bikaranîn wê wateyên cihêreng hebe. Lêbelê, pir kes dipejirînin ku eşîrek bi giranî li gorî prensîbên xizmtîyê an erdnîgarîyê tê organîzekirin. Li gorî Paul White, gelek lêkolîneran ji xwe re esas girtine ku civaka kurd ji demên kevnar heta îro bi rêgezek rast bi pêş ketîye ku eşîr wekî naverok û naveroka ebedî ya celebek "çîroka bêdawî" ye.

White dibêje, ev xeyalek e. Ew behsa Dresch (1993:391ff) dike ku dibêje civaka eşîrî ya îroj ji ya civaka pêş-modern cuda ye û heta radeyekê pirtir li gorî civaka nûjen a ku tê de kar dike, hatîye adaptekirin. Eşîrên li Bakurê Kurdistanê (Tirkîye) tenê sîbera tiştan e ku berê temsîl dikirin û bi ihtîmaleke mezin dê paşeroj ji bilî pergala eşîrî ya kevn li ser tişteki din be. Lê dîsa jî paradoksek e ku pêvajoya ber bi avahîyeke maqûltir ve nayê wê wateyê ku pergala eşîrî di dewleteke kapîtalîst de xwedî îmkana adaptasyona tam a modela hilberîna kapîtalîst e. Ji ber ku wek Paul Dresch jî dibêje: "Zîmanê eşîrtîyê ne yê dewletê ye."

Malbat

Ji hev cudakirina têgînên malbat, êl û eşîrê ne hêsan e. Eşîr bêtir bi rengekî netewe an dewlet bi xwe vedibêje, her çend ew jî li ser prensîba girêdanên xwînê ava bûye. Klanek bêtir wekî formek malbata berfireh, an malbata berfireh tête hesibandin. Malbata kevnepîyê kurd bi şebekeyên hişk bi rolên bi tundî ji hev veqetandî û sistemek bi bandor a cezayan tê dîyarkirin, ku tê de

ferd di torekê de ye ku bi giranî ji xizm û xizmên xwe pêk tê û tenê diguhere, an bi zayin û mirinê tê guhertin. Ji bo piranîya kurdan, tora malbatê dê di hemû qonaxên jîyanê de komek referansa civakî ya bingeîn pêk bîne. Li gorî vê yekê em girîngîya malbat û eşîrê di pêkhatina nasnameya kurdî ya ferdî de dizanin. Dema ku jîyana li derveyî malbatê ne zelal xuya dike, pir caran di nav malbat û xizmên xwe de nasnameya kurd-bûnê tê pejirandin û meşrûkirin. Bê guman girîngîya malbatê dê di malbatên bi danûstendina torê ya hindik, tevgerîya kêr û cihê ku endamên malbatê nêzî hev dijîn, bi gelemperî li bajarên piçûk an civatên gundan bi hêztir be. Ji bo kurdên ku bi tena serê xwe, yan jî di nav malbateke biçûk a li bajarên de dijîn, entegrasyona navbera xizmên xwe û bandora rojane ya malbatê dê lawaztir bibe. Lê dîsa jî, gelek kurd, bêtir ku ji xizmên xwe dûr bin, di dîroka malbatê de xwedî lengereke derûnî ne û bêtir ku sînoren erdnîgarî hebe, di nav wan de peywendîyên derûnî yên xurt hene. Ev girêdana derûnî bi kûrahî di raman û tevgera kurdan de cih girtiye û di nîqaşên

li ser têgeha nasnameya kurdî de alîyekî girîng e. Kurd ne komeke homojen in. Gelê kurd îro li çar welatên cuda bi şert û mercên çandî û siyasî û di bin bandorên cuda de dijîn. Lê dîsa jî piranîya kurdan di çarçoveyekê de behsa kurdûna xwe dikin. Ev yek bi dizî yan eşkere bê kirin, gelek girêdayî bi çarçoweya siyasî ya ku ferd tê de ye, di heman demê de bi derfet û hêza ferdî ve girêdayî ye ku vê yekê dijber bike.

Namûs (hîsyet) û erk

Weke ku hat gotin, têngîna namûsê di nava kurdan de xwedîyê kevneşopîyaka kevnar e û divê ku mirov li gorî avahîya eşîretî ya ku li ser prensîba girêdanên xwînê hatîya ava kirin, were berçav girtin. Di beşa destpêkê de, Profesora Tor Halfdan Aase li ser têgeha namûsê û çawa namûs bi hêzê re têkildar e nîqaşek teorîkî ya berfireh dike. Ji ber vê yekê ev têngî li vir bêtir nehatîye berfirehkirin. Lêbelê, girîng xuya dike ku meriv dîyar bike ku rûmet bi pabendûna bi qaîdeyên destnîşankirî, bi nirx û normên wê eşîrê ve girêdayî ye ku meriv ji wê ne.

Namûs bi rola takekesî ve, û statûya bi rolê ve girêdayî ye; wek mêr, jin, zarok, pîr an serek û reftarên ku ji rolê hewce dike pêk tînin. Lê namûs di heman demê de xwedan pîvanek giştgir e ku bi gelek awayan tevger û şêwaza ramana eşîrê û endamê eşîrê yê ferdî bi rê ve dibe, û ku serbixwe ji têgihîştina kesane ya kesane heye (Akman 1988, 1994). Namûs divê li hember paşperdeya civatê were nixandî ku li dora wê faktorên dikarin bikevin leyiztikê û namûsa eşîrê tehdîd bikin. Paralel têgîna namûsê têgîna erkê ye. Wezîfeya kurd e ku parastina namûsê bike ku namûsa eşîrê, namûsa jinan, milk û axê tê de ye. Ku endam bi şertên şerefê tevbigerin û ger ku namûs were tehdîdkirin, divê meşrûkirin û xurtkirina namûsê biparêzin. Heger norm şikestin, yan endam namûsa xwe û ya eşîrê neparêzin, dibe sedema windakirina namûsê (bê hisyet bûn). Di wê rewşê de, eşîr pêbawerîya derve winda dike. Her kesê ku rasterast li dijî tiştê ku bi îdeolojîk tê dayîn, an bi pratîkî tê pejirandin tevdigere, di herî xirab de wekî bêrûmetî (bê averû) tê hesibandin, mohra

şermê li hemî eşîrê datîne. Li gorî çî qewimî, ev dikare encamên cidî hebe, carinan jî bibe sedema mirinê.

Windakirina namûsê dikare gelek sedem hebin. Dema bûyera ku bûye sedema windakirina namûsê, ax an jî jinan eleqedar bike, encamên wê karesatker bin û hem di asta takekesî û hem jî di asta kolektîf de dibin sedema krîzên bingeîn. Bi gotîneke din, bûyerên wiha dibin sedema rewşên marjînal. Bertek li dijî kes an jî kesên ku şerm li eşîrê kirine, di hin rewşan de jî li dijî mexdûrên bêguneh ên ku tam bi neheqîyê, nerasterast şerm û namûsa eşîrê tîne. Ji bo jinan, windakirina namûsê bi îhmalkirin, bêbawerî, piştî destavêtin, an ji ber nerazîbûna kesên din, dikare bibe sedema cezayên tund ên wekî destdirêjîya devkî an fîzîkî ya rasterast. Di rewşên giran de, jinên ciwan hatine kuştin ku rûmeta malbatê an eşîrê vegerînin (Keskin, 1999). Di gelek rewşan de, peyva namûsê jî wekî alibî ji bo xilaskirina jina nexwestî hatîye bikaranîn. Her wiha hatîye belgekirin ku bi hezaran jin, bi taybetî li Başûrê Kurdistanê,

li ser qanûna kuştina namûsê (kuştina li ser namûsê) hatine kuştin (Morgan, 2000). Sedem çi dibe bila bibê, jin bi gelemperî li ser îdeolojîya namûsê pir dijwar têne şikestin. Ger jin weke bêrûmet bê binavkirin, li derveyî çarçoveya civakîya xwezayî ya malbat û eşîrê tê bicihkirin, ev yek ji bo herkesî encamên derûnî yên mezin bi xwe re tîne. Ji bo piraniya kurdan îro îdeolojîya namûsê di şiklê xwe yê resen de heta radeyekê guherîye, her çend li herêmên herî kevneşopî yên Kurdistanê hîna jî tê xwestin ku ev îdeolojîya namûsê were domandin.

Çîrokên kurdî

Lêkolîna vegotinê di van salên dawî de gihîştîye cihekî ku her ku diçe mezintir dibe û bi lêkolînên cûrbecûr berdewam dike. Bi taybetî mijarên çandî yên wekî etnolojî û folklorîstîkî bi dest xistîye ku her gav qada lêkolîna navendî ye. Vekolîna vegotinê tê vê wateyê ku meriv bi taybetî bi kapasîteya wê ya çîrokê giranîyê dide çîrokê. Perspektîfa vegotinê wekî dîsîplînek lêkolînê tenê kûrbûna tiştê ku lêkolî-

nerên di van mijaran de her gav kirine temsîl dike (Palmenfelt, 2000:37). Çîrokek ji awayên din ên ragihandinê tê veqetandin ku destpêka wê û dawîya wê ya zelal heye. Ew pir caran gelek mijarên tevlihev dihevine ku di dawîyê de çareserîya xwe dibîne. Alîyekî girîng ê vegotinê ev e ku ew bi gelemperî li xaçerêya di navbera cihanên cûda yên ezmûnan de pêk tê. Çîrok kêman caran ronîkirina sade ya serpêhatîyên mirovan e, lê belê divê wekî pêvajoyek ku tê de serpêhatîyên jîyanê vediguherin formeke vegotinê çîrok hem çîrokê û hem jî serpêhatîyên guhdaran teşe bike (Drakos, 2000:71).

Di tiştên li jêr de, ez ê vê çîrokê ji bo ronîkirina aliyên îdeolojîya namûsê ya kurdan ku di nakokîya du eşîrên kurdan de xuya dike, bikar bînim. Di çanda kurdî de kevneşopîya çîrokbêjîya devkî xwedî cihekî pir taybet e. Hem wekî diyardeyek civakî, hem jî ji ber wê yekê ku beşeke mezin ji gelê kurd ne dikarin bixwînin û ne jî binivîsin, an jî gelek xwedan xwendengehek wusa kêman in ku gihîştina hesabên nivîskî dijwar dibe. Di nav sedsalan de, helbesta kurdî di serî

de devkî bûye. Heman tişt ji bo çîrokbêjîya dewlemend a kurdan jî derbas dibe. Li diwanxaneyên gelek mezin û serekên eşîran, helbestvanên kurd di demên berê de forumek peyda dikirin ku tê de helbesta xwe ya epîk an lîrik çêdikirin. Heman helbest li gelek qehwexane, salonên meclîsên gel û li derdora gundan jî hatine gotin. Helbestvan, ango çîrokbêj, hosta bûn ku materyalên xwe li gorî hewcedarî û berjewendîyên temaşevanan biguncînin. Li salona meclîsê gelek caran gelerî û demokratîk bû, di salonên mezinan de jî gelek caran rengekî aristanîtir digirt. Ev diyardeyeke berbelav e li her derê ku helbest bi taybetî devkî ye (Tordarson:1985:6).

Di nav kurdan de jî kevneşopîyeke çîrokbêjîya gelerî heye ku gelek caran li ser bûyerên rasteqîn hatiye avakirin û weke ku vebêjer û guhdar serpêhatî û şîroveyên xwe di nava çîrokan de derdixe holê. Ne kêmkarî, çîrok temayan ji jîyan û debara eşîrên kurdan ên cihêreng digirin. Ji ber ku Kurdistan di serî de ji warên eşîrên curbecur pêk tê, xwezayî ye ku gelek gotin jî li ser vê yekê bin. Mijarek bijarte namûs û tolhilda-

na xwînê ye. Li ser dîrok, cîrantî û dostanîya eşîrên curbecur, lê her wiha li ser dijminatîyên eşîrî û xwînîyên domdar, ên domdar jî gelek vegotinên kurdan hene. Ev ya dawî li ser bingeha kevneşopîya kevnar a îdeolojîya rûmetê ya kurd di civaka kurd de dikare were ravekirin. Têkilîya kurdan bi têgeha namûsê re cuda ye.

Wek ku li jor hat behskirin, malbatên kurd ên kevneşopî wê hez bikin ku îdeolojîya namûsê bilind binirxînin û ji bo parastina bingeheke wê bikevin nav hewldanan, lê malbatên din wê kêmkarî hest bi wê bikin.

Pevçûn (netîfagî)

Mijarek bijar e. Li jêr, çîroka du eşîrên kurd yê cîranên hev tê vegotin ku di nav çend nîşan de, di encama tolhildanê de, dixuye ku qet naqede, xem û xisar û xemgînî li hev kirine. Pevçûn dema ku ajalên yek eşîrê ji qada mêrga cîran re derbas dibin dest pê dike, lê tenê ji hêla şirovekirina bûyera eşîra din ve tê piştrastkirin. Çîrok li ser dijminatîya eşîrî ya rasteqîn (şerê eşîratan) di navbera du eşîrên kurd ên dewlemend de ye. Ji ber vê sedemê, ti navên kesan

an navên cîyên erdnîgarî ku bikaribe kesek ji wan kesên ku bandor bûne nas bike, nehatîye bikaranîn. Ne salên tam têne bikar anîn, ne jî tişteke din ku dikare li bûyerên rastîn were şopandin. Çîrok bi regekî ku pêla vegotinê dide tê pêşkêşkirin, her çend di rastîyê de çend sal di navbera her carê de ku eşîr li hev ketine jî derbas bûne. Ji bo fêhmkirina paşxaneyê nakokîya ku di navbera herdu eşîran de derketîye, em vedigerin dawîya salên 1890î û piştî pêşveçûna dijminatîya eşîran a heta roja îro dişopînin.

Bi salan e ku herdu eşîr li taxeke aram û bê nakok digerîyan, bi hev re bazirganî dikirin, li gund û bajaran heman bazar û dikan bi kar dianîn û nexasim jî heman çavkanîya avê ji bo hemû gelan bi kar dianîn. Bi salan - çemê fireh û zelal ku di navbera herêmen wan de diherikî - nîşanek xurt a bawerî û hevaltîyê ye. Ji ber vê sedemê, zehmet e ku meriv fêm bike ka cîrantîyek dirêj û baş çawa bi dawî bû, û çima yek ji endamên eşîrê di her kêlîyê de nekarî dawî li şerê rûmetê di navbera wan de bîne. Herdu eşîr jî xwedîyê heman esl, dîrok, ziman û çandê

bûn – kurdên ku di nav qeyranên dîrokî yên hevpar de jîyabûn. Di dirêjahîya serdeman de, dagirkerên bîyanî hertim hewl dane wan li hember hev bikarbînin da ku nakokî û nakokîyên di navbera eşîran de ji bo berjewendîyên xwe bi kar bînin. Pir kes dê bipirsî ka çima eşîrên kurdan ji serpêhatîyên xwe yên dîrokî yên tal û ji eşên ku li pey wan hatine ders dernexistine. Tecrubeya piranîya malbatên kurd ên ku ji ber dijminatîyên eşîrî derketine, rasterast an dîrokî hene. Bûyerên felaket ên ku bi gelemperî ji van dijminatîyan diqewimin bandorê li tevahîya eşîrê dike û pir caran şopên kûr dihêlin. Gelek eşîrên kurdan paşê zehmetî kişandine ku xwe ji dorhêla xirab a dîrokî ya ku dijminatîyên eşîrî yên bi vî rengî diafirînin, biqetînin.

Dijberî dikare xwedan rehên pir dirêj be ku gumanan ji navenda pevçûnê wêdetir belav dike - pir caran ew dikare li civatên dîyasporayê jî were şopandin. Nakokî dikarin bi gelek awayan derkevin holê, hin jî di encama gotegotan de. Dibe ku xala destpêkê bêkêmasî be. Lêbelê, tohildan dikare hertişt be, lê ne hindik be û bere-

vajî, encamên wê yên xirab hebe. Diqewime ku dijminatîya eşîretî ewqas diqewime ku êdî yek ji endamên eşîrê nikane ji bîr neke ku eslê wê çi bû, an jî fersenda wê fêhm bike. Di şûna wê de, eşîrên - ku carek din xwe dijmin îlan dikin - êrîşên xwe yên devkî û fizîkî yên ku xuya dikin bêwate li ser hev didomînin. Dema ku ji derve ve were temaşekirin, trajedî di ro-nahîyek pir bêaqil de tê danîn, ku pêkhatin û sêwirana cîhan-bînîya eşîran li gorî mentiqê xwe dimeşe, li ser bingeha nîrx û normên ku têne şopandin, bêtî ku têgihîştina kesane ya endamên eşîrê ji wan re were şopandin.

Erdên herdu eşîran ku ji vir pê de A û B têne gotin, pir nêzikî hev in, wek ku min got, tenê bi çem ve têne sînorkirin - ku li herdu alîyan deştên bi bereket hene ku ber bi jor ve ber bi aliyên gelîyên bedew ve diherike. Herdu eşîran heta ku tê bîra kesî ev herêm parve kîrîne. Di demên berê de, pir caran bûye ku deverên eşîran ji yên din bêtir xwe-nivîsandî bûne. Eşîran bi xwe sînoren li hemberî hev xêz kîrîne, ku paşê bi awayê belgeyên nivîskî, an jî wekî rêgez û peymanên ne-nivîsandî hatine danîn.

Nakokîya di navbera eşîrên A û B de tam di encama bînpêkirina peymanên sînorî de derketîye holê, yên ku ji aliyê mexdûr ve weke bînpêkirineke êşkere dihatin dîtîn. Herdu eşîr xwedî kerîyên pez ên mezin bûn. Bi gelemperî bêpîrs-girêk dihat dîtîn ku pez di nav sînorê xwedîyê xwe de bimîne. Lê dîsa jî rojekê çêbû ku çend pezên eşîra A rastî erdekî qedexekirî hatin û dema eşîra cîran B dît ku pezên bîyanî li erdê wan diçêrînin, pez di cih de hatin kuştin û vegeşîyan aliyê rast ê sînorkirî. Pezêkirin û çêrandina pez li ser xaka eşîra cîran wek kiryareke provokatîf û bînpêker hatibû dîtîn. Bi vê yekê re zevî û milk hat bînpêkirin û gumaneke mezin a li ser nîyeta rast a eşîra cîran bi vê çalakîyê derket holê. Eşîra acîzbûyî nizanibû ku eşîra cîran bi vê yekê îşaretek tirsnak daye ku milk û sînoren cîran êdî nepêkan in.

